# ZIMANÊ KURDÎ

# NAVÎN
# 1

2022-2023

**Amadekar:**

**Komîteya Zimanê Kurdî**

**Lêveger:**

**Komîteya Şopandinê**
**Komîteya Redekteyê**
**Komîteya Dîzaynê**

**Mafên amadekirin û weşanê ji Saziya Minhacan û Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê re parastî ne.**

**Çapa yekem**

**2022-2023**

# NAVEROK Û BELAVKIRINA WANEYAN


| Qonax | Naverok | | meh |
|---|---|---|---|
| QONAXA YEKEM | Beşa Yekem | 7 | |
| | Pêşangeha Kulîlkan | 9 | Rezber |
| | Ziman û Hînkirina Ziman | 17 | Rezber |
| | Hunera Danûstandinê | 22 | Cotmeh |
| | Beşa Duyem: | 31 | Cotmeh |
| | Ciwantî | 33 | Cotmeh |
| | Lasakirin | 39 | Cotmeh |
| | Nezanî Derdekî Zor e | 47 | Cotmeh |
| | Beşa Sêyem | 55 | Mijdar |
| | Gencîneya Zêran | 57 | Mijdar |
| | Bijîşkê Bisinc | 64 | Mijdar |
| | Fîzîya û Kareva | 71 | Mijdar |
| | Beşa Çarem | 77 | Mijdar |
| | Girîngiya Hunerê li Cem Kurdan | 79 | Mijdar |
| | Cilûbergên Kurdî | 86 | Berfanbar |
| | Koçerî | 95 | Berfanbar |
| | Beşa Pêncem | 105 | Berfanbar |
| | Geştyarî | 107 | Berfanbar |
| | Gola Ûrmiyê | 114 | Berfanbar |
| | Nirxandin û Navber | | |
| QONAXA DUYEM | Rojhilatê Kurdistanê | 120 | Reşemeh |
| | Beşa Şeşem | 127 | Reşemeh |
| | Welat | 129 | Reşemeh |
| | Bi Zanistê Parastina Welat | 135 | Reşemeh |
| | Ey Şehîd | 141 | Reşemeh |
| | Beşa Heftem | 147 | Avdar |
| | Lîstikên Werzişî | 149 | Avdar |
| | Şetrenc | 156 | Avdar |
| | Werziş | 163 | Avdar |

| | | |
|---|---|---|
| Beşa Heştem........................................ | 171 | meh |
| Bextiyar û Bedbext........................................ | 173 | Cotan û Gulan |
| Silûrî û Tilûrî........................................ | 180 | |
| Rûspiyê Bêdeng........................................ | 187 | |
| Nirxandin û Navber | | |

# BEŞA YEKEM

## ZIMANÊ KURDÎ

1

Pêşangeha Kulîlkan

2

Ziman û Hînkirina Ziman

3

Hunera Danûstandinê

# Armancên Beşê

**Di dawiya vê beşê de, ji xwendekar tê pêşbînîkirin ku bikaribe:**

1. Waneyan bi rengekî dirust û tekûz bixwîne.

2. Zaravayên zimanê kurdî û herêmên ku li wan tên bikaranîn, nas bike.

3. Helbestê bi rengekî awazî bixwîne, naveroka wê tê bigihêje û çend xêzan jê ezber bike.

4. Fêrî şêwazê axaftinê û awayê danûstandinê bibe.

5. Wateyên peyvên nû nas bike û wan peyvan di nivîsên xwe de, bi kar bîne.

6. Gotarê nas bike û wê ji cureyên nivîsên wêjeyî yên din, nas bike.

7. Cînavên kesane yên xwerû û tewandî û yên şanîdanê nas bike û mînakan di derbarê wan de bide.

8. Di derbarê mijara beşê de, bi rengekî wêjeyî û xweş, hest, raman û nêrînên xwe, weke mijar derbirîne.

# 1 PÊŞANGEHA KULÎLKAN




## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. **Li herêma te li rex zimanê kurdî çi zimanên din hene?**
2. **Zaravayê ku tu pê diaxivî kîjan e:**
   a. **Zazakî**
   b. **Kurmancî**
   c. **Goranî**
   d. **Soranî**

# PÊŞANGEHA KULÎLKAN




Îsal li Amedê pêşangeha kulîlkan tê lidarxistin.

Ji hemû deverên Kurdistan û cîhanê kulîlkên curbicur beşdar dibin. Li hola pêşangehê ya mezin çar kulîlkên rengereng nêzî hev hatibûn danîn. Kulîlka yekem ji rojavayê Kurdistanê ji bajarê Serê Kaniyê bû. Bi spehîbûna xwe dil direvand û çav dikêşan. Bi wan rengên xwe, rewşeke seyr diafirand. Li rex wê, kulîlkeke din ji başûrê Kurdistanê ji bajarê Silêmaniyê amade bibû. Şivik, perik û bişkovên wê, li ser rûyê bîna gernijîneke xweşik nîgar dikir. Te digot qey bi firçeya wênesazekî efsûnker hatiye neqişkirin.

Li hember her du kulîlkan, kulîlkeke buhiştî ya sêyem bi cih bibû. Ew ji bakurê Kurdistanê ji herêma Sîpanê Xelatê bû. Xûlbûna pelik û şaxê wê, ciwaniyeke pir xweşik raberî derdorê dikir. Kulîlka çarem jî ji herêma Hewremanê ji rojhilatê Kurdistanê bû. Te digot ku xunava wê, ava jînê ye. Di navbera wan kulîlkan de, danûstandinek çêbû.

Kulîlka rojavayê Kurdistanê: Li vê pêşangehê bi hezaran gul û kulîlk beşdar bûne, xweziya min bi zimanê hemû gul

û kulîlkan zanîba û bi her kulîlkekê re, danûstandin bikira. Kulîlka Sîpanê Xelatê: Mafê te heye, lê hinekî zehmet e! Ji ber ku ji her herêmekê yan welatekî re zimanekî cuda heye. Ew ziman li gorî xweza û erdnîgariya wê çêbûye. Ew ziman ji bo jihevfêmkirin û danûstandinê hatiye afirandin. Kulîlka Silêmaniyê: Mirov xeyal bike ku ziman tune ba wê çawa danûstandin bihata kirin? Wê mirovan çawa zanîn parve bikira û dê çawa bipêşketin çêbiba? Bê guman dê mirov gelekî lipaşketî û nezan ba! Heke ziman tune ba, wê xwendin jî tune ba. Her weha wê zanîngeh, amojgeh û dibistan jî tune bana. Dêmek ziman, kilît û alava ku mirov bi saya wê ji zindîwerên din cuda bûye û gihaye vê astê ji zanebûnê.

Kulîlka Hewremanê: We aşopa min fireh kir û we girîngiya zimanî baş zelal kir. Lê ez dixwazim vê yekê bibêjim, zimanê me tevan kurdî ye û ew xelekeke ku me tevan dighîne hev û ji miletên dîtir cuda dike. Kulîlka Serê Kaniyê li rojavayê Kurdistanê dijî û tevahiya kurdên rojavayê Kurdistanê bi zimanê kurdî; zaravayê kurmancî diaxivin. Her weha kulîlka Sîpanê Xelatê li bakurê Kurdistanê dijî, ew jî bi kurdî diaxivin (zaravayê kurmancî û zazakî). Lê kulîlka Silêmaniyê li başûrê Kurdistanê bi zimanê kurdî zaravayê soranî diaxive. Ew jî pir nêzî zaravayê kurmancî ye û bi hêsanî her du zaraxêv ji hev tê digihêjin. Her weha em jî li herêma Hewremanê bi zimanê kurdî; zaravayê goranî diaxivin.

Em li Rojhilatê Kurdistanê hem bi kurmancî, hem bi soranî, hem bi goranî û hem bi lorî diaxivin, lê tev jî di bin banê zimanê kurdî de dighêjin hev.

Kulîlka Serê Kaniyê: Zimanê kurdî li hemû deverên Kurdistanê tê bikaranîn û ev yek jî nîşana yekparçebûna welatê kurdan e beriya ku bê parçekirin. Her weha li gelek deverên dîtir, derveyî sînorê Kurdistanê, zimanê kurdî bi rêjeyeke kêmtir tê bikaranîn. Mîna li Suriyeyê li Şam, Heleb, Reqa … li Turkiyeyê li Stenbolê, Endedol û Ezmîr …

## Wateyên Peyvan

| Peyv | Wate |
|---|---|
| **Spehîbûn** | Xweşikbûn |
| **Seyr** | Sosret |
| **Bîna** | Kesê ku dibîne. |
| **Bişkov** | Xunc |
| **Xûl** | xûz, tewandî |
| **Xunav** | Çelapikên baranê yên hûr. |
| **Amojgeh** | Peymangeh |
| **Zarava** | Şêwezar |
| **Zaraxêv** | Kesê ku bi zaravayekî diaxive. |

## Guftûgoya Waneyê

1. Li Amedê çi hatibû lidarxistin?
2. Kî beşdarî vê pêşangehê bibû?
3. Kulîlka rojavayê Kurdistanê, çima xweziya xwe bi wê yekê anî ku bi hemû zimanan zanîba?
4. Li gorî kulîlka Sîpanê Xelatê, ziman ji bo çi hatiye afirandin?
5. Heke ziman tune ba, dê jiyana mirovan çawa ba?
6. Li rojhilatê Kurdistanê çend zarava hene?
7. Li gorî têgihiştina xwe, tu jî pênaseyekê ji ziman re, binivîse.

## Hîndarî

**1.** Em valahiyên li jêr bi peyvên guncaw dagirin:




**2.** Ji hevokên li jêr hevoka herî biwate, hilbijêre û hevokekê mîna wê, saz bike:

- Ziman li gorî xweza û erdnîgariyê çêbûye.
- Ziman ji bo jihevfêmkirin û danûstandinê hatiye afirandin.
- Ziman hizir bixwe ye; ew landika ku hemû çandên cîhanê dihundirîne.

..........................................................................................................

Tu hînî zimanan bibe ey ciwan
Ne tenha tu kurd î, li pêş te cihan

Eger tu zimanên mezin zanibî
Xem û kul ji ser te bi wan radibî

Tu rûsî bixwêne, tu çînî bizan
Firensî ji ber ke, çi ye ê nezan?

**(Cegerxwîn)**

**3.** Em helbesta li jor bixwînin û sojeya wê hilbijêrin:
- **a.** Divê mirov hînî zaravayên kurdî bibe.
- **b.** Divê mirov hînî zimanên din bibe.
- **c.** Divê mirov hînî zimanê xwe û yên din jî bibe.

**4.** Em gotinên li jêr di nava hevokan de, bi kar bînin:

**Seyr** **Ragihandin** **Zindîwer**

**5.** Em li rojhilatê Kurdistanê hem bi kurmancî, hem bi soranî, hem bi goranî û hem bi lorî diaxivin, lê tev jî di bin banê zimanê kurdî de, digihêjin hev.
- **a.** Ji nivîsa li jor daçekan destnîşan bikin.
- **b.** Ji nivîsa li jor navê cihekî taybet destnîşan bikin.

## Lêveger "Xalbendî"

Nivîs, di hêla danûstandinê de ji bo mirovahiyê navgîneke sereke ye. Her weha ew bingeheke ku şaristaniyê xwe li ser ava kiriye. Weke hizirmendê elman Alexander von Humboldt (Alîksender von Hombult) dibêje: "Heke mirov bi saya ziman bûye mirov, wî bi saya nivîsê karîbû danûstandinê jidûr pêk bîne, raman, hest û aşopên xwe weke belge biparêze û heta roja me ya îro tomar bike." Bê guman nivîsa mîxî ji nivsên herî kevn tê dîtin. Bi rêya nivîsa mîxî bi hezarên belgeyên kevn gihaştine roja me ya îro. Bi rêya zimanzanên zimanên kevn û şûnwarnasan, ev nivîs hatine aşkerekirin û ronîkirin.

Nivîsa mîxî, ji afrîneriya mirovê Rojhilata Navîn e; ev nivîs li Mezopotamyayê hatiye berhênan kirin. Nivîsên mîxî û hîroglîfî ya ku li Misrê hatiye afrandin, ji nivîsên herî kevin ên ku li cîhanê hatine dîtin.

1. Di nivîsa li jor de, çend xalbendî derbas bûne?
2. Navên xalbendiyên ku di nivîsê de derbas bûne, binivîse.
3. Ji bilî van xalbendiyan (yên ku te ew nivîsîne) çend xalbendiyên din hene?
4. Li gorî te, bicihkirina van xalbendiyan di nivîsê de, roleke çawa dilîze?


**Rahênan:**

1. Em hevokên li jêr bi rêya xalbendî û gihanekan, bi hev ve girê bidin û ji wan deqekê saz bikin:
   a. Tacedîn ji Mîrê Cizîra Botan re got  Tu dizanî Bekir bedkar e çima tu wî li ber dergehê xwe dihewînî
   b. Mîr got rast e ez bi nemerdî û fêlbaziya wî dizanim
   c. Kar û barê me mîran bi kesên weke Bekir tê kirin
   d. Lê

   **(Ev bendên li jor ji gotûbêja ku di navbera Tacedîn (hevalê Memo) û Mîrê Cizîra Botan (birayê Zînê) de, çêbûye, hatiye wergirtin).**

2. Hevokên li jêr baş bixwînin û xalbendiyên guncaw bi kar bînin:
   a. Pêşiyên me dibêjin bi dinyê bişêwir bi aqilê xwe bike
   b. Pêşiyên me dibêjin aqil di seriya de ye ne di riya de ye
   c. Mirov dikare dirêjahiya kenarên sêgoşeyê bi rêya teoriya Vîsaxorsê destnîşan bike

# 2 ZIMAN Û HÎNKIRINA ZIMAN




## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**1. Ji welatekî heta welatekî din çi cudahî hene:**

- **a. Ziman**
- **b. Xwarin**
- **c. Cilûberg**
- **d. Her sê**

**2. Ji hêmanên dewlemendiya zimanekî:**

- **a. Dewlemendiya ferhenga wî**
- **b. Xurtbûna rêzimaniya wî**
- **c. Berfirehbûna wêjeya wî**
- **d. Her sê**

# ZIMAN Û HÎNKIRINA ZIMAN



Vejîne zimanê xwe ey xwendevan
Nebûye milet hîç kesek bê ziman

Zimanê me xoş û xeroş û ciwan
Eger baş bizanî tu nakî zîyan

Tu kurmancîya xwe ji bîra nekî
Eger baş nizanî, divê zêde kî

Elîfba û dîwan û ristan bixwîn
Heta ko wekî min nebî dilbixwîn

Binêre zimanê te çend dewlemend
Li bajêr, tu carek xwe bigihêne gund

Bibêne çi şêrîn e ev reng ziman
Çi payebilind û çi rûmetgiran

Bi pirsên xwe nazik, bi dengan sivik
Ne pirsek bîyanî bî nabî girik

Tu paqij ke zarê xwe şêrîn bike
Bi kurdî tu baxêv û qêrîn bike

Wî bighêne rêza zimanê mezin
Bi nûsîn û ristin, bi kêş û wezin

Zimanê bîyanî dixwênî çi ra
Zimanê xwe carek naxwênî, bira

**(Cegerxwîn)**

## Wateyên Peyvan

| Peyv | Wate |
|---|---|
| **Vejîne** | Geş bike |
| **Hîç** | qet, yekcar |
| **Zîyan** | xerabî, zirar |
| **Payebilind** | Pilebilind |
| **Zar** | Ziman |
| **Nûsîn** | Nivîsîn |
| **Ristin** | Hûnandin |
| **Kêşe** | Wezin |
| **Rûmetgiran** | Birûmet |

## Guftûgoya Waneyê

1. Malika li jêr şîrove bike:

   **Vejîne zimanê xwe ey xwendevan**
   **Nebûye milet hîç kesek bê ziman**

2. Di malika duyem de, Seydayê Cegerxwîn dabaşa çi dike?
3. Li gorî helbestvan, mirov wê çawa hînî zimanê xwe bibe?
4. Di helbestê de, çima helbestvan daxwaza serdana gundan dike?
5. Çima helbestvan daxwaza, axaftin û qêrînkirina bi zimanê kurdî dike?

## Hîndarî

1. Ji helbetsê malika ku bala te kêşaye, destnîşan bike û binivîse:
2. Malika ku wateya hevoka li jêr raber dike, destnîşan bike:

   **“Zimanê xwe bi rêya nivîsê û kifşkirina wêjeya xwe bigihîne asta zimanên din”**

3. Em rêzbenda malika li jêr destnîşan bikin.

   **Binêre zimanê te çend dewlemend**
   **Li bajêr, tu carek xwe bigihêne gund**

4. Di malika yekê de, di her xêzekê de, çend tîpên dengdêr hene?

## Gotar


Gotar: Ew nivîseke wêjeyî ye û bi rengekî pexşanî tê nivîsîn. Ew bi şêweyekî xweş, hêsan û herikbar, tê hûnandin. Armanc ji nivîsa gotarê ew e ku bi rengekî xweş agahiyên ku nivîskar bi wan bawer e bigihîne xwendevanên xwe.

## Jêderên perwerdeyê

Mirov di jiyana xwe de, di gelek qonaxan re derbas dibe û rastî gelek jêderên perwerdeyê tê. Yek ji jêderên herî girîng jî dê û bav e. Pêşiyên me dibêjin: "Mal dibistan e." Zarok rûyên herî pêşîn ku bi çavên xwe dibîne, rûyên dê û bav in; ji wan fêrî gotinên pêşîn û sincê pak dibe. Piştî dê û bav, dibistan tê.

Li dibistanê, mirov fêrî gelek tiştên girîng dibe; bi saya dibistanê, xwendin, zanîn û têgihiştinên mirov berfirehtir dibin. Dibistan landika ku mirov fêr dike ji bo ku bikaribe bijî û sûdê bide derdora xwe. Li hêla din di pileya sêyem de, hevalê mirov tê. Pendek heye dibêje: "Ji min re bibêje tu bi kê re dimeşî, ez ê ji te re bibêjim tu kî yî." Bandora hevaltiyê pir li ser kesayeta mirov heye; hevaltî jiyanê xweş dike û têkiliyên mirov berfireh dike. Di pileya çarem de, rola ragihandinê tê. Telefizyon, enternêt û navgînên danûstandinê, derbasî her kuncikeke jiyanê bûne. Bandorê li sinc, agahî û perwerdehiya mirov dikin. Ev navgîn çekeke dualî ye. Dibe ku ji mirov re bibe piştek û sûdeke mezin bide mirov û dibe ku bandorên wê yên neyînî jî hebin.


# 3 HUNERA DANÛSTANDINÊ



## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. Mirov bi rêya çi dikarin ji hev fêm bikin:
    a. Bi rêya tevgerên gewdeyî.
    b. Bi rêya ziman.
    c. Bi rêya nivîsê.
    d. Bi her sêyan.
2. Kîjan şêwaz dikare zû ramanên mirov ragihîne:
    a. Ziman.   b. Tevgerên gewdeyî.
3. Li gorî te divê danûstandin li ser çi bingehî bin?

# HUNERA DANÛSTANDINÊ



Danûstandin, di navbera zindîweran de, tiştekî gelekî balkêş û efsûnî ye. Ev danûstandin hem di navbera zindîwerên bejahî û hem jî di navber  zindîwerên avî de, çêdibe. Bi gotineke din, danûstandin di navbera zindîweran de, tiştekî xwezayî ye. Gava berx tî dibe, dibare û gava qaz rastî metirsiyekê tên, dikin qîjqîj û hev agahdar dikin. Li hêla din li gel mirovan,  bi saya bipêşketina ziman, ev danûstandin bi lez pêk tên. Bê guman beriya ev danûstandin di navbera mirovan de, pêk bên, di hindirê mirov de, bikaranînên nepenî pêk tên, mîna hizirîn û aşopkirinê. Mirov van danûstandinan pirê caran ji ber pêwîstiyê pêk tîne. Gelek caran di mejiyê mirov de, gelek pirsnîşan çêdibin, lewra bi kesên dîtir re danûstandinan pêk tîne û digihêje bersivên wan pirsan. Ji bo ku mirov danûstandineke baş pêk bîne, pêwîst e mirov rêgezên van danûstandinan baş nas bike.

**Xala yekem:** Divê danûstandin li ser bingehê niyaza paqij bê avakirin. Armanca wê naskirina rastiyan û agahiyên nû be. Ev yek jî bi rêya hizirîna baş û hilbijartina peyvên guncaw pêk tê. Pêşiyên me dibêjin:

“Baş bipêje û paşê bibêje.” Hizirîna baş û xweşbikaranîna peyvan, nîşana axêverekî baş e.

**Xala duyem:** Xweşguhdarîkirin e. Tê gotin: “Her Guhdarekî baş, axêverekî baş e.” Divê di guhdarîkirinê de, baldarî hebe; hişê kesê guhdar li ramana ku tê vegotin be; nabe ku em bi dirûv guhdar bin û bi hiş dûrî ramana axêver bin. Ev yek di rêya pirsan re tê xuyakirin. Di cihê guncaw de û bêyî ku em axaftinê bibirin, di derbarê mijarê de, bipirsin an jî li ser zêde bikin.

**Xala sêyem:** Girêdayî zimanê bedenê ye. Di dema axaftinê de, hem axêver û hem kesê ku guhdar dike, divê tevgerên gewdeyî baş bi kar bînin; nabe ku kesê guhdar pişta xwe bide kesê axêver an axêver rûyê xwe ji kesê guhdar bizivirîne. Li gorî ku zanist diçespîne, ziman ji sedî heftê zimanê bedenê ye. Berovajî wê, nabe ku em kesê axêver bi pirtemaşekirinê tengav bikin.

**Xala çarem:** Pêwîst e em bizanibin ku ji her gotinekê re hêzek heye. Ev gotina ku ji mejî weke pêleke sinirî bi rê ve diçe, bandorê li têlên deng dike û weke deng tê der, bandorê li mejî û hestên mirovan dike. Pêwîst e ev hêza gotinê ya erênî û neyînî, baş bê nasîn. Her gav em hewl bidin ev gotin hizirekî nû û hestekî xweş biafirîne.

**Li vir nivîs bi dawî nabe, hûn jî li ser lênûsa xwe xaline nû, dûrêz bikin:**

**Xala pêncem:**
...........................................................................................................
...........................................................................................................
...........................................................................................................

## Wateyên Peyvan

| Peyv | Wate |
|---|---|
| **Barîn** | Dengê berxikan e. |
| **Nepenî** | Veşartî |
| **Pêjan** | Patin |
| **Beden** | Gewde |
| **Çespandin** | Tekezkirin |
| **Tengavkirin** | Acizkirin |
| **Sinir** | damar, rehik |

## Guftûgoya Waneyê

1. Di benda yekem a waneyê de, dabaşa çi tê kirin?
2. Rêgeza yekem a danûstandinê çi ye?
3. Divê armanca danûstandinê çi be?
4. Pêşiyên me dibêjin: «Baş bipêje û paşê bibêje.» Vê gotinê şîrove bike.
5. Taybetiyên guhdarê baş, çi ne?
6. Gava mirov danûstandinê dike, pêwîst e, tevgerên gewdeyî çawa bin?
7. **«Divê em bizanibin ku ji her gotinekê re hêzek heye.»** Vê hevokê bi mamoste û hevalên xwe re, parve bikin û şîroveyeke guncaw jê re, binivîsin.
8. Serenavekî guncaw ji waneyê re hilbijêrin.

## Hîndarî

**1.** Em peyvên li jêr di hevokan de, bi kar bînin:

**(avî, giyan, barîn, nepenî, niyaz, axêver, sinir)**

**2.** Em valahiyên li jêr bi peyvên guncaw dagirin:

"Tê gotin: "Her …………. baş, axêverekî baş e. Divê di …………….. de, baldarî hebe; hişê guhdar li ramana ku tê vegotin be; nabe ku em bi ……….. guhdar bin û bi hiş dûrî ramana axêver bin."

**3.** Em ramanên li jêr li gorî dûrêzkirina wan di waneyê de, bi rêk û pêk bikin:

**a.** Danûstandin di navbera hêmanên xwezayê de, heye.
**b.** Di danûstandinê de, guhdarîkirin, hêmanekî sereke ye.
**c.** Tevgerên gewdeyî yên bitore nîşana baldariyê ne.
**d.** Hizirîn baş berî axaftinê, dibe sedema têgihiştin û jihevfêkirinê.

**4.** Em dijwateyên peyvên li jêr binivîsin:

| **Peyv** | **Dijwateya wê** |
|---|---|
| Hêz | ………………… |
| Sûd | ………………… |
| Tengavkirin | ………………… |
| Standin | ………………… |

## Rêziman

# Lêveger "Cînav"

### Bizan ku min yar tu yî

Li baxê bulbul ez im
Muqîmê dilkul ez im
Bi ah û xulxul ez im
Ê xem lê nazil ez im
Qalibê bêdil ez im
Sohtiyê sêfîl ez im

Horiya Rehman tu yî
Muhra Sultan tu yî
Îsayê zeman tu yî
Min dike derman tu yî
Ê ez di ferman tu yî
Hekîmê Luqman tu yî

**(Feqiyê Teyran)**

**1.** Gelo cînav cihê çi digirin?
**2.** Em helbesta li jor baş bixwînin û cînavan destnîşan bikin.
**3.** Em damika li jêr temam bikin:

| Cînavên kesane yên xwerû | Cînavên kesane yên tewandî | Cînavên Şanîdanê |
|---|---|---|
| Ez | Min | |
| Tu | ......... | Ev |
| Ew | Wî | ......... |
| ......... | ......... | |
| ......... | Me | |
| ......... | ......... | |
| | Wan | |

**4.** Em valahiyên li jêr bi cînavên guncaw dagirin:

Ne çiyayê bêrez, ne koçerê bêpez, ne ….. kesê timî bibêje ….
Ecelê gêrikê tê, baskên …… çêdibin.
Hespa kihêl zengoyan nagihîne …..

**5.** Em cînavên li jêr di nava hevokan de, bi kar bînin û navên wan destnîşan bikin:

**Ez - Min - Ev - Kî - Çar**

**a.** Ez ji wêjeya kurdî û bi taybet ji çîrokan, pir hez dikim.
(Ez cînava xwerû ye)
**b.** Min ................................................................................ (       )
**c.** Ev ................................................................................ (       )
**d.** Kî ................................................................................ (       )
**e.** Çar ................................................................................ (       )

## Derbirîn

Mirov bi saya ziman ji hev tê digihêjin; ziman navgîna ragihandina mirov e. Bi rêya ziman hest, agahî û zanist tên veguheztin. Di derbarê ziman û girîngiya wî de, mijarekê li gorî xalên li jêr binivîse:

1. Pênaseya ziman.
2. Zimanên ku li herêma te tên bikaranîn.
3. Zimanê te yê dayîkê.
4. Zaravayê ku tu pê diaxivî.
5. Cudahî di navbera zimanê dibistanê û zimanê malê de.
6. Çawaniya fêrbûna zimanekî din

# BEŞA DUYEM

## HÊZA CIWANTIYÊ

1
Ciwantî

2
Hunera Danûstandinê

3
Nezanî Derdekî Zor e

# Armancên Beşê

**Di dawiya vê beşê de, ji xwendekar tê pêşbînîkirin ku bikaribe:**

1. Waneyan bi rengekî dirust û tekûz bixwîne.
2. Rola qonaxa ciwantiyê di jiyana mirov de nas bike.
3. Neyîniyên lasakirina korane nas bike û ji wan dûr bikeve.
4. Helbestê bi rengekî awazî bixwîne, naveroka wê tê bigihêje û çend xêzan jê ezber bike.
5. Wateyên peyvên nû nas bike û wan peyvan di nivîsên xwe de bi kar bîne.
6. Daçek û paşdaçekan bi bîr bîne û mînakan di derbarê wan de bide.
7. Wateya bingehîn û mecazî ji hev cuda bike û wan di hevokan de, bi kar bîne.
8. Hemwate û dijwateyê ji hev nas bike û di derbarê wan de, mînakan bide.
9. Nêrîneke baş di derbarê gotinên pêşiyan de, bistîne û hin gotinên pêşiyan ên nû bi dest bixe.
10. Di derbarê mijara beşê de, bi rengekî wêjeyî û xweş hest, raman û nêrînên xwe weke mijar derbirîne.

# 1 CIWANTÎ




## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. Ji hêla temen ve, qonaxên ku mirov di wan re derbas dibe bihejmêre.
2. Li gorî te, ciwantî çi ye?
3. Kesên ciwan dikarin bi çi karî rabin?

# CIWANTÎ



Ji qonaxên jiyana mirov, ciwantî qonaxeke xweş û berhemdar e. Ji ber ku di vê qonaxê de hêza ciwanan ji hêla laşî, hişî û derûnî ve di asteke bilind de ye, ew derfeteke zêrîn e ji bo ku ciwan şiyan û karînên xwe li pêş bixe û armancên xwe destnîşan bike.

Bê guman, xwendin hêmana sereke ye ku ciwan hemû hêvî û armancên xwe li ser ava bike. Xwendin kilîta hemû deriyên hêvî û armancan e. Ew dikare hemû deriyan li pêşiya ciwanan veke û rêya pêkanîna wan jê re hêsan û xweş bike. Lewra pêwîst e ku ciwan guhdanê bi xwendina xwe bike û tê de serkeftî be. Her weha pêwîst e xwendekarê ciwan bi baldarî waneyên xwe bişopîne û demeke taybet û guncaw ji bo wan terxane bike. Dema ku ciwan di xwendina xwe de serkeftî û li pêş be, bingeha wî ya zanistî xurt dibe û ew xwendin jê re dibe mîna çekekê ku bikaribe gavên xwe ber bi ayendeyê ve biavêje û hemû zehmetî û astengiyan derbas bike.

Li rex xwendina pirtûkên dibistanê, xwendina pirtûkên din jî asoya hizir û hişmendiya ciwanan firehtir dike. Bi rêya xwendina pirtûkan, ciwan dikare gelek tiştan nas bike û asta zanîn û agahiyên xwe bilind bike û bi pêş bixe. Lewra divê hezkirina xwendina pirtûkan di dilê her ciwanekê/î de peyda bibe û ev xwendin jê re bibe çandeke berdewam.

Di qonaxa ciwantiyê de, li bal her ciwanekê/î behreyek peyda dibe. Ji bo geşkirina vê behreyê û bipêşxistina wê, qonaxa ciwantiyê guncawtirîn qonax e. Dibe ku yek ji muzîkê yan wênesaziyê, yan wêjeyê yan sporê û her wekî din hez bike. Pêwîst e ku ew van

behreyan paşguh neke û hewl bide ku vê hezkirinê derîne warê pratîkê û baş li ser rahênan û perwerde bibe. Ev dê alîkariya wî bike ku di pêşerojê de afrîner û berhemdarekî zîrek û xuya be.

Cihê ciwanan di civakê de, cihekî pir berz û bilind e. Ciwan hêza civakê ya sereke ye, rola wan di avakirin û geşkirina civakê de, heye û pir bibandor e. Ciwan dikarin nirxên civaka xwe biparêzin û guhertinine berbipêş, tê de çêbikin.

Dema ku nifşê ciwanan di civakekê de saxlem û bixêr be, bê guman ew civak jî wê saxlem û li pêş be, lê dema kiryar û reftarên nerênî di nav ciwanan de belav bibin, civak jî yekser pê bandor dibe û dibe mîna laşekî nexweş û lawaz. Mîna lasakirina korane, bikaranîna heyberên hişber, li peyketina modêlên vala, mana demdirêj di tora enternêtê de û lîstina demdirêj bi lîstokên elektironîk …

Xaleke din û girîng a ku xwe di qonaxa ciwantiyê de, disepîne, destnîşankirina armancan e. Divê ciwan armancên xwe di vê jiyanê de destnîşan bike û ji bo pêkanîna wan kar bike. Armanc jî du beş in, armancên qonaxî yên nêz û armancên stratejîk ên dûr. Dibe ku ciwanek bixwaze di pêşerojê de bibe stêrknas, ev armanceke bingehîn û dûr e, ji bo pêkanîna wê gelek kar û xebat gerek e. Dibe ku armanc serkeftina di refê de be, ev armanceke qonaxî ye, lê ji bo pêkanîna armanca dûr pir girîng e.

## Wateyên Peyvan

| Peyv | Wate |
|---|---|
| **Şiyan** | Karîn |
| **Ayînde** | Pêşeroj |
| **Geşkirin** | Xurtkirin |
| **Saxlem** | Dirust |
| **Hişbir** | Tevzîner, heyberên ku mirov ji hiş dixin. |
| **Stêrknas** | Astronomî, zanista ku asîman û stêrkan, lêkolîn dike. |

## Guftûgoya Waneyê

1. Çima ciwantî qonaxeke xweş û berhemdar e?
2. Çawa bingeha ciwanan, ji hêla zanistî ve xurt dibe, ?
3. Li gorî te mirov çawa dikare, behreya xwe geş bike?
4. Navên hin behreyên ku bala te dikêşin bibêje.
5. Navê reftarekî xerab ku bandorê li ciwanan dike, bibêje û çawaniya xelasbûna ji wî reftarî pêşniyar bike.
6. Armancên qonaxî yên nêz û armancên stratejîk ên dûr çi ne?

## Hîndarî

**1.** Em hêmaya (√) li hemberî agahiya rast û hêmaya (×) li hemberî agahiya çewt, xêz bikin:

**a.** Ji qonaxên jiyana mirov, ciwantî qonaxeke xweş û berhemdar e. (     )

**b.** Xwendin kilîta hemû deriyên hêvî û armancan e. (     )

**c.** Divê ciwan armancên xwe di vê jiyanê de destnîşan neke û ji bo pêkanîna wan kar neke. (     )

**2.** Hevoka ku wateya wê ji hevokên din cuda ye, nîşan bike:

**a.** Mirovê bîna dikare, rengan bi hêsanî ji hev nas bike.

**b.** Ew bi awirên xwe sawê belav dike.

**c.** Min ji çavên wê nas kir ku bûyerekê rû daye.

**d.** Kesê bîna dikare mijarê baş analîz bike.

**3.** Em peyvên li jêr di nava hevokan de, bi kar bînin:

**(hişbir, terxankirin, qonax, geşkirin)**

**4.** Em dijwateyên peyvên li jêr binivîsin:

| Peyv | Dijwateya wê |
|---|---|
| Zivir | ................ |
| Pîrbûn | ................ |
| Qenc | ................ |
| Taybet | ................ |

## Rêziman

### Lêveger "Daçek"

Kamûran Bedirxan, di sala 1895`an de, li Stenbolê ji dayîk bûye. Doktoriya mafnasiyê li Elmaniyayê wergirtiye. Ji bilî karê mafnasiyê, wî xebateke pir hêja ji ziman û wêjeya kurdî re kiriye. Ji berhemên wî: Rêzimana kurdî, Zimanê Mader, Tefsîra Quranê, Destpêka Xwendin, Ferhenga Kurdî ...

**1.** Di deqê de, peyvên binxêzkirî hene, em çi navî li wan dikin:
- **a.** Gihanek
- **b.** Daçek
- **c.** Baneşan

**2.** Valahiyên li jêr dagire:
- **a.** Li paş daçeka **"di"**yê paşdaçeka **"de"**yê ................
- **b.** Li paş daçeka **"li"**yê tu paşdaçek ........................

**3.** Wateyên peyvên li jêr çi ne:
- **a.** Ji .............
- **b.** Li ................
- **c.** Bi ................
- **d.** Di ................


# 2 LASAKIRIN



## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. **Dema ku mirov hawê mirovine din bike em çi navî li vê kirinê dikin:**
   a. **Kar**
   b. **Lasakirin**
   c. **Rahênan**
2. **Li gorî te lasakirin, di kîjan waran de, baş e?**

# LASAKIRIN



Li beravê çemekî boş, kevok, mar û jîjo li hev civiya bûn.

Mar bi fîzfîza dengê xwe yê zîz bala her kesî dikêşa. Jîjo got: Çermê te çiqas hilû ye; tu dibêjî ku çermê te bi ron hatiye boyaxkirin. Her weha neqşên ku li ser çermê te ne, dilê me diêşînin, tu dibêjî ku bi firçeya şêwekarekî efsûnker hatine neqşandin. Jîjo hinekî engirî û weha berdewam kir: Ax xweska ev sîxên tûj, ne li ser pişta min bana!

Mar got: Weha mebêje, tu bi van sîxên xwe, dikarî parastina xwe bikî; di rewşên metirsiyê de, ew dibin mîna guleyan û her kes xwe ji ber didin alî. Mar cardin kir fîzînî û got: “Di rewşên metirsiyê de, ez yekser dikevin nîşana êrîşkeran de; ne mû hene ku bi wan xwe biparêzim û ne jî per hene ku ez bi wan bifrim!”

Kevokê got: “Hûn her du nirxên taybetiyên xwe yên gewdeyî nizanin; heke ne ji hilûbûn û şayîkbûna gewdeyê mar ba, dê tevgera wî, gelekî zor û zehmet ba. Anha mar dikare bi daran ve hilkişe û bi hêsanî dikare têkeve kunên parastinê. Her weha taybetiyên ku li gel jîjo jî hene ne kêmî taybetiyên ku li gel mar hene. Jîjo jî dibe gulokeke strî û her zindî sed hesabî jê dike.”

Jîjo û mar guh li gotinên kevokê nekir û her yek bi rêyekê de, çû. Jîjo rojekê hewl da ku sîxên xwe bi tevahî rake, lewra pişta xwe da zinarekî û pê xwirand. Hêdî hêdî sîx bi sîx rakirin û rût û tazî ma. Piştî ku hemû sîx rakirin, bi sermayê hesiya û gelekî lewaz xuya kir. Gava jîjo giha nav hevalên xwe, her kes pê keniya û tinaziyên xwe pê kirin. Lewra bi lez ji nav wan çû û berê xwe da mar da ku gazinên xwe pê bike. Di rêya çûnê de, li qiraxa avê rawestiya û li dirûvê xwe yê nû nêrî; jîjo matmayî ma; dirûvê wî bêmirês bibû û weha weke girikekî hevîr a bêpergal mabû. Bi lez birêveçûna xwe berdewam kir û giha gel mar, lê çi bibîne mar jî qalikekî hesinî danîbû ser pişta xwe û bi zor tevger dikir.

Mar got: Ev çi ye jîjoyê bêsîx, te çi bi serê xwe kiriye!

Jîjo bêyî ku bersivê bide, pirs kir: Ev çi qalikê hesinî yê giran e, ev qet ji bo te nabe! Her duyan ji ber vê lasakirina korane, poşmanî diyar kir!

Ji bo çarekirina vê pirsgirêkê, her duyan berê xwe da, kevoka pendyar.

Kevokê baş li wan guhdar kir û ji bo çarekirina vê pirsgirêkê weha pêşniyar kir:

Hûn her du bi rewşa xwe nerazî bûn, lewra we hev lasa kir. Divê zindîwer bi rengekî hişmend tev bigerin û lasakirina korane nekin. Lasakirin ji bo qezenckirina tiştên baş delîveyeke baş e, lê heke ji bo qezenckirina hin taybetên ku li zindî nayê, metirsî û cihê sivikbûna hişî ye. Ji bo çarekirina vê pirsgirêkê, divê mar vî qailkê hesinî ji ser pişta xwe biavêje û vegere, tevgera xwe ya asayî. Her weha divê jîjo, xwe ji serma û ajalên dirinde biparêze, heta sîxên wî ji nû ve şîn bibin.

## Wateyên Peyvan

| Peyv | Wate |
|---|---|
| **Boş** | gur, xurt |
| **Boyxkirin** | Rengkirin |
| **Engirîn** | acizbûn, tengezarbûn |
| **Zinar** | Kevirê mezin |
| **Tinaz** | Henek |
| **Qirax** | Kenar |
| **Bêmirês** | Bêpergal |
| **Girik** | Guloka hevîr a piştî stranê. |
| **Korane** | Çavgirtî |
| **Pendyar** | xwedîpend, zana |
| **Delîve** | Derfet |
| **Asayî** | Normal |

## Guftûgoya Waneyê

1. Li beravê çem kî li hev civiya bûn?
2. Jîjo xweziya xwe bi çi anî?
3. Mar çi bersiv da jîjo?
4. Ji benda yekem û duyem re, serenavekî guncaw, binivîse.
5. Naveroka gotina kevoka pendyar, bi kurtî binivîse.
6. Jîjo çawa dirûvê xwe guhert?
7. Çima jîjo poşman bû?
8. Mar ji bo çi qalikekî hesinî, danî ser pişta xwe?
9. Tevgera mar piştî vê guherînê çawa bû?
10. Sojeya vê waneyê çi ye?
11. Sê kesan ji nav xwe hilbijêrin û vê waneyê weke şano, li hember hevalên xwe li ser dika polê, bilîzin.

## Hîndarî

**1.** Em navê her ajalekî bigihînin sembola ku pê tê nasîn:

| | |
|---|---|
| Mar | Xweşikbûn |
| Kevok | Derman |
| Xezal | Aştî |

**2.** Em deng û giyandarê ku wî dengî derdixe bigihînin hev:

| | |
|---|---|
| Berx | Orîn |
| Çêlek | Şîhîn |
| Hesp | Barîn |
| Mar | Çîvçîv |
| Çûk | Fîzîn |

**3.** Em peyvên li jêr di nava hevokan de, bi kar bînin:

**(fîzîn, şayikbûn, qalik, kun, gazin, êrîşker)**

**4.** Em valahiyên li jêr bi peyvên guncaw dagirin:

Hûn her du bi rewşa……….. nerazî bûn, lewra we hev ……… kir. Divê zindîwer bi rengekî ………… tev bigerin û lasakirina …………. nekin.

## Rêziman

### Wate

1. Em hevokên li jêr bixwînin û wateyên wan gotûbêj bikin:
   - a. Şagirt, her sibe diçin dibistana xwe.
   - b. Kulîlk, bi kêfxweşî diçin dibistanê.
   - c. Pêşeroja me, hînî hemû zanistan dibin.
2. Peyva “kulîlkê” di cihê kîjan peyvê de, hatiye bikaranîn?

   **Şagirt** **Cotkar** **Mamoste**
3. Peyvên “pêşeroja me” di cihê kîjan peyvê de, hatine bikaranîn?

   **Şagirt** **Helbestvan** **Xerat**
4. Di hevokên li jor de peyvên (kulîlk, pêşeroja me) bi rengekî:
   - a. Mecazî  hatine bikaranîn?
   - b. Rasteqîn,  hatine bikaranîn?

Peyv li gorî wateya xwe:

**Wateya bingehîn:** Ew wateya peyvê ye ku di serê her mirovî de, cih girtiye û dema ku tê gotin, yekser tê nasîn.

Mînak:

Min kevir da destê hoste.
Avakirin bi zanebûn û kedê, sergihayî dibe.

**Wateya mecazî (xaze):** Peyv ji wateya xwe ya bingehîn û resen dûr dikeve û di wateyeke din de, tê bikaranîn.

Mînak:

Hişê wî mirovî vekirî ye.
Ez ji ber van serkeftinan, difirim.

**“Tişte kî ji min re bibêje, lê bila bi zimanê te be. Reng e ku ez tê negihêjim, lê bila bi zimanê te be.”**

**(Yilmaz Guney)**

1. Ev nivîsa li jor ji çi pêk hatiye:
   - Tîp
   - Peyv
   - Hevokan.
   - Her sê bersiv rast in.
2. Di nivîsê de, ew peyvên ku li dû hev hatine rêzkirin, wateyên wan weke hev in an na û çima?
3. Ji peyvên li jêr, peyvên ku wateya wan weke hev e bighînin hev:

| | |
|---|---|
| **Dîwar** | **Pêlav** |
| **Sol** | **Xame** |
| **Dot** | **Keç** |
| **Pênûs** | **Bend** |
| **Zerik** | **Tas** |

**Hemwate: Ew peyv in ku nivîsa wan cuda ye, lê wateya wan yek e.**

## Dijwate

1. Ev hevokên li jêr gotinên pêşiyan in, em valahiyên wan dagirin û wateyên wan sergihayî bikin.
   - Qenc kiro bi xwe kiro, …………kiro bi xwe kiro.
   - Mirovê ……………., li ser navê xwe tê.
   - Qencî û ……………., ji heman cihî derdikevin.
2. Peyvên “**qencî û xirabî**”:
   a. Hemwate ne
   b. Dijwate ne
   c. Nêzwate ne

**Dijwate: Ew peyv in ku ji aliyê wateyê ve, dijberî hev in.**

Mamoste di hundirê polê de, pêşbirkek li dar xist. Xwendekar kirin du grûp û her grûpekê hin gotin ji xwe re amade kirin.
Mamoste li ser depê ev serenav nivîsî **"Dijwate"** û di pey re damikek bi awayê damika li jêr, saz kir:

**Pêşbirk:**

| Peyv | Peyva li dijî wê |
|---|---|
| | |
| | |
| | |

1. Ji grûpa yekem Rênas ev peyv nivîsîn: dirêj, girs, bilind û jor.
2. Ji grûpa duyem Hêlînê ev peyv nivîsîn: kin, hûr, nizim û jêr.
   » Mamoste got: "Di beşa yekem ji vê pêşbirkê de, her du gurûp yeksan in."

Hûn jî bi alîkariya mamoste, vê pêşbirkê bi rengekî piratîkî pêk bînin.



## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. Gelo mafê mirov çawa tê bidestxistin:
   a. Bi rêya zanebûnê.
   b. Bi rêya tikayê.
   c. Bi hêzê
   d. Bi zanebûn û hêzê.
2. Rola zanebûnê di bidestxistina maf de, çi ye?
3. Navê helbestvanekî kurd ku doza zanebûna gel dikir, bîne ziman.

# NEZANÎ DERDEKÎ ZOR E



Bes e cilka xewê bavê li te şerm e tu raza bî
Bizane ku cîhan dewr e, divê her dem tu pê rabî

Şev û roj tim wek hev nayên cih û warê xwe dughêzin
Di vî çax û zemanî de divê pespor û zana bî

Ji kerwanê dem û wextê nemîne tu li paş kurdo
Bi hêvî û bi lavlava ew ê heqê te winda bî

Bi `ilm û xwendin û zanîn divê pişta xwe bijdînî
Bi kona re bidî û bistîn, ne yê sîwak û werda bî

Dema kar û xebatê ye xwe med alîkî dem seyd e
Bela para te ya şêr be ne ya wawîk û hirça bî

Heq  û `edalet xurtî ye ji mêj ve hatîye gotin
Destûra Enûşêrwan di qanûna Hemorabî

Nezanî derdekî zor e xebat tev pûç û vala ye
Bi kawikî nezanî tê şivanê kar û berxa bî

Evê êşa sedê sala nekî derman bi zanînê
Di bin destê neyara de tu dê reswa û kola bî

Tiving û xame ku her du li meydanê nebin hemdem
Tu naghêjî tu armanca eger gurcik ji pola bî

Welat keç ap û dotmam e, bilind û çavreş û rind e
Divê îro di meydanê wekî Xesro û Kawa bî

Bira Tîrêj bi dilxwazî  didî ber te riya jînê
Welat doj e eger tê de ne serbest û ne aza bî

Bi hêvî me ku şi`ra min ji te r` îro bibî dersek
Nebî xurdê  çira kîwra ne bilûra li ber ga bî

**(Seydayê Tîrêj)**

## Wateyên Peyvan

| Peyv | Wate |
|---|---|
| **Şerm** | fedî |
| **Diguhêzin** | Diguhêrin |
| **Çax** | Dem |
| **Lavlav** | Gazin |
| **Wawîk** | Torî |
| **`Edalet** | Dadmendî |
| **Kawik** | Hişsivik |
| **Reswa** | perîşan, reben |
| **Pola** | Hesinekî pir xurt e. |
| **Xesro û Kawa** | Navê mêrxasekî kurd e. |
| **Doj** | Dojeh |
| **Aza** | Azad |
| **Xurd** | êzing, ardû |

## Guftûgoya Waneyê

1. Malika li jêr şîrove bike.
   **Bes e cilka xewê bavê li te şerm e tu raza bî**
   **Bizane ku cîhan dewr e, divê her dem tu pê rabî**
2. Di kîjan malikê de, helbestvan doza zanebûn û jêhatîbûnê dike?
3. Li gorî helbestvan mirov bi hêvî û lavayan, wê bigihêje armancên xwe?
4. Di malika çaran de, gotina «kona» tê çi wateyê?
5. Li gorî helbestvan, kengî kar û xebat, pûç û vala ye?
6. Malika heştan şîrove bike.
7. Bilindbûn, çavreşbûn, û rindbûn, taybetiyên kê ne?
8. Kawa, navê lehengekî kurd e. Di derbarê wî de, tu çi agahiyan, dizanî?
9. Ramana bingehîn ya helbestê çi ye?
   a. Welatparêzî
   b. Zanebûn
   c. Azadî
   d. Her sê

## Hîndarî

**1.** Em ji malika li jêr peyvên hemwate û dijwate derînin:

**Şev û roj tim wek hev nayên cih û warê xwe dughêzin**
**Di vî çax û zemanî de divê pespor û zana bî**

**2.** Em rêzbenda malika li jêr destnîşan bikin:

**Bes e cilka xewê bavê li te şerm e tu raza bî**
**Bizane ku cîhan dewr e, divê her dem tu pê rabî**

**3.** Di her xêzikekê ji xêzikên helbestê de, çend tîpên dengdêr hene?

**4.** Di derbarê Seydayê tîrêj de, lêkolîneke kurt pêk bîne; tê de xalên li jêr di ber çavan re derbas bike:

- **a.** Navê wî yê resen çi bû?
- **b.** Li kîjan deverê ji dayîk bûye?
- **c.** Navê berhemeke wî binivîse.

**5.** Di malika li jêr de, navdêr û hevalnavan destnîşan bike:

**Welat keçap û dotmam e, bilind û çavreş û rind e**
**Divê îro di meydanê wekî Xesro û Kawa bî**

## Gotinên Pêşiyan

Kalemêr ji neviyê xwe re got:

Dem bûye payîz; dar pelên xwe diweşînin û seqa hêdî hêdî sar dibe. Pêşiyên me gotine: "Dem ji demê fedî nake."

Nevî: Rast e, seqa sar bûye, di pey payîzê re zivistan tê. Pêşiyên me gotine: "Zivistan hat, cilika feqîran qetiya."

Kalemêr: Pêşiyan tiştek ji me re nehiştine û negotine. Beriya payîzî, havîn heye pêşiyên me di derbarê wê de, weha gotine: "Kevirê havînan bavên bin kulînan."

Nevî: Gotinên pêşiyan bê hûde nehatine gotin. "Pêşiyên me gotine: Bipirs ji kalê zemanan û ji xortê geriyayî."

Kalemêr kenî û weha got: Weke min û te.

1. Gotinên pêşiyan li gorî te, tên çi wateyê?
2. Gotinên pêşiyan bi çi armancê, tên gotin?
3. Li gorî nêrîna te, gelo di gotinên pêşiyan de, lihevhatina gotinan heye?
4. Di derbarê piraniya mijaran de, gotinên pêşiyan hatine gotin, tu jî mijarekê hilbijêrî û çend gotinên pêşiyan bi mamost û hevalên xwe re, parve bikî.

## Derbirîn

1. Di derbarê ciwanekî ku hêza xwe baş bi kar aniye û bi karine serkeftî rabûye, mijarekê binivîse û xalên li jêr di ber çavan re derbas bike:
   a. Navê wî ciwanî çi ye?
   b. Di kîjan qadê de, ew serkeftî ye?
   c. Bi çi rêbazî gihaye wê serkeftinê?
   d. Mirov dikare çi sûdê ji serbûriya wî bigre?
2. Çîrokeke ku neyîniyên lasakirina korane raber dike, peyda bike û bi rengekî xweş li hember hevalên xwe bixwîne.

Em ji her du derbirînên li jor derbirînekê hilbijêrin û binivîsin.

# BEŞA SÊYEM

## KAR, SINC Û ZANIST

1 Gencîneya Zêran

2 Bijîşkê Bisinc

3 Fîzya û Kareva

# Armancên Beşê

**Di dawiya vê beşê de, ji xwendekar tê pêşbînîkirin ku bikaribe:**

1. Waneyan bi rengekî dirust û tekûz bixwîne.
2. Girîngiya kar û girêdana wî bi sinc ve, tê bigihêje.
3. Helbestê bi rengekî awazî bixwîne, naveroka wê tê bigihêje û çend xêzan jê ezber bike.
4. Wateyên peyvên nû nas bike û wan peyvan di nivîsên xwe de, bi kar bîne.
5. Peyvên hemdeng û hemnivîs nas bike û di derbarê wan de, mînakan bide.
6. Serenav û hevenavan ji hev nas bike û di derbarê wan de, mînakan bide.
7. Dastanê nas bike û wê ji cureyên nivîsên wêjeyî yên din cuda bike û navê hin dastanên kurdî nas bike.
8. Di derbarê mijara beşê de, bi rengekî wêjeyî û xweş, hest, raman û nêrînên xwe, weke mijar derbirîne.

# 1 GENCÎNEYA ZÊRAN



## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. **Çend navên pîşeyên ku bala te dikşînin, bibêje.**
2. **Berhevkirinekê di navbera kesê karker û kesê tiral de, çêbike.**
3. **Di derbarê mirovê karker de, gotineke watedar, bibêje.**

# GENCÎNEYA ZÊRAN

Dibêjin carekê li gundekî kalemêrek hebû gihaştibû temenekî ku êdî ji hêz ketibû û nema dikarîbû karê giran bike. Sê kurên kalemêr ên qert hebûn, her sê di ser serê hev re bûn, lê pir zexel û xemsar bûn, ji bilî xwarin, vexwarin û xewkirinê tu karekî din ji wan nedihat.

Zeviyeke kalemêr hebû, her sal diçand û ji berhemên wê debara jiyana xwe dikir, xwe û malbata xwe xwedî dikirin.

Dawiya werza payîzê ye, hemû gundiyan zeviyên xwe cot kirine û tov çandine. Tenê zeviya kalemêrê belengaz necotkirî û neçandî maye. Bav bala xwe didêyê, dem dereng bûye û eger zevî cot nebe û neyê çandin; wê çandiniya wan têk biçe û rewşa wan pir perîşan bibe. Radibe gazî her sê kurên xwe dike. Her sê bira çavlixew lingên xwe bi dû xwe de kişandin û bi cangiranî derbas cem bavê xwe dibin.

Bav bi dengekî westiyayî dest bi axaftinê kir û got: Kurên min, va hûn rewşa min dibînin, temenê min bûye zêdetirî 90 salî, êdî ez nizanim sibe ez ê sax bim an na. Îro min hûn civandin ji bo ku tiştekî pir girîng ji we re bibêjim, lewra baş guhên xwe bidin min û guhdarî bikin.

Her sê bira çavên xwe yên şelêqgirtî paqij kirin û  bi baldarî li bavê xwe guhdar dikirin. Gava ku bav dît, her sê kurên  wî  hişyar in, axaftina xwe berdewam kir û got: “Heta ez li ser xwe bûm û hêza min têrê dikir, ji bo ku ez we xwedî bikim û pêdiviyên we dabîn bikim min kar dikir, lê îro wek hûn dibînin ez ji hêz ketime û ditirsim piştî ku ez jiyana xwe ji dest bidim hûn dê rezîl û perîşan bibin, lewra min got divê tiştekî ji we re bihêlim ku hûn bikaribin debara jiyana xwe pê bikin.

Her sê bira guhên xwe miç kirin, çavên xwe beloq kirin û hemû hişê xwe dan ser gotinên bavê xwe.

Bav axaftina xwe dewam kir û got: “Binêrin kurên min! Min gencîneyeke tijî zêr ji we re hiştiye, ez dixwazim hûn derînin û li hev

par bikin."
Her sê birayên zexel bi vê gotina bavê xwe pir şad bûn, lewra birayê mezin got: "Em te spas dikin bavo! Bi rastî ev tiştekî pir baş e ku tu dikî, de ka wê gencîneyê bide me, em jî dê vê qenciyê ji bîr nekin."

Bav dibêje: Min gencîne li cihekî veşartiye, biçin derînin û li hev parve bikin.

Kurê biçûk dibêje: "Ka zû bibêje bavo, te gencîne li ku derê veşartiye? Em biçin derînin."

Bav: Min gencîne di bin axa zeviyê de veçartiye, lê min di pey re ji bîr kiriye, lewra divê hûn baş bikolin û lê bigerin.

Her sê bira bi lez ji cem bavê xwe derdikevin, radihêjin tevrikên xwe û berên xwe didin zeviyê.

Her sê birayan dest bi kolana zeviyê kir. Her roj ji berbangê heta tarî diket erdê, wan zevî dikola. Bi vî awayî û di heyama heft rojan de, hemû zevî hate kolan, lê gencîne nehate dîtin.

Piştî ku her sê birayan kolana zeviyê bi dawî kir û gencîne nedît, bi dilekî şikestî berê xwe da bavê xwe û jê re got : "Bavo ka gencîne? Me tu gencîne nedît." Bav girnijî û got: "De biçin tovên xwe jî biavêjin zeviyê û biçînin, piştî çend mehan hûn ê gencîneyê bibînin."

Wê gavê her sê birayan mebesta bavê xwe nas kir û nirxê kar nas kir. Rabûn çûn tovên xwe jî avêtin zeviyê, ji wê rojê de her sê bira hatin guhertin û ji kar hez kir.

## Wateyên Peyvan

| Peyv | Wate |
|---|---|
| **Qert** | gihiştî, kamil |
| **Zexel** | Tiral |
| **Perîşan** | belengaz, hejar |
| **Cangiran** | Laşgiran |
| **Miçkirin** | Rast rawestiya. |
| **Beloq** | Gelekî çavên xwe vekir. |
| **Deranîn** | Derxistin |
| **Berbang** | beyanî, serê sibê |

## Guftûgoya Waneyê

1. Çima kalemêr, nema dikarîbû kar bike?
2. Taybetiya zarokên kalemêr çi bû?
3. Malbata kalemêr çawa debara xwe dikir?
4. Çima kalemêr dabaşa gecîneyê kir:
   a. Xapandin
   b. Karpêkirin
   c. Naskirina nirxê kar
5. Piştî her sê bira bi mijara gencîneyê hesiyan , çawa tev geriyan?
6. Li gorî nêrîna te, her sê birayan, gencîne bi dest xist an na?
7. Navekî nû ji waneyê re hilbijêre.
8. Sojeya vê waneyê çi ye? Bi heval û mamosteya/ê xwe re parve bike.

# Hîndarî

**1.** Em peyvên li jêr di hevokan de, bi kar bînin:

**(cangiran, tevrik, zexel, qonax)**

**2.** Em karên li jêr li gorî girîngî û dema wan dûrêz bikin:
(çûna dibistanê, serdana hevalekî, lîstina bi fotbolê)

**a.** Karê yekem ………………………..
**b.** Karê duyem ………………………..
**c.** Karê sêyem ………………………

**3.** Em valahiyên li jêr bi peyvên guncaw dagirin:

Bav: Min ............di bin axa zeviyê de veşartiye, lê min di pey re ji bîr kiriye, lewra divê hûn baş ................ û lê bigerin.

Her sê bira bi lez ji cem bavê xwe ................, radihêjin tevrikên xwe û ................... xwe didin zeviyê.

**4.** Em bi rêya peyvên li jêr hevokan saz bikin û di pey re weke mijar binivîsin:

» ( deriyên, zanist, kilîtkirî, mirovan, vedike, re, ji)
» (dikeve, mirov, bi,  zanistê, bi, pêş, kar, û)
» (zanist, hev, û, temam, hev, bi, pêş, dixin, dikin, kar, û)

.......................................................................................................
.......................................................................................................
.......................................................................................................

## Rêziman

# Hemdeng

Em hevokên li jêr bixwînin û paşê bersivên pirsan bidin:

- Ew mirov  gir e.
- Ew mirov bi gir e .
- Rovî, neçû kunê, hejek bi teriya xwe vekir.
- Rovî, bi rola mêtina heyberên pêwîst ên ku di xwarinê de hene, radibe.

**Pirs:**

1. Wateya peyva "gir"di her du hevokan de, wek hev e, yan na?
2. Nivîsa peyva "gir" di her du hevokan de, wek hev e, yan na?
3. Wateya peyva "rovî" di her du hevokan de, wek hev e yan na?
4. Çi cudabûn di navbera her du peyvan de, heye?
5. Em dikaran çi navî li peyvên wisa bikin:
   - » Hemdeng
   - » Hemnivîs
   - » Hemwate

**Peyvên hemdeng:** Ew peyvên ku nivîs û dengên wan yek in, lê wateya wan ne yek e û li gorî bikaranîna wan di hevokê de, tê xuyakirin.

**Peyvên hemnivîs:** Ew peyv in ku nivîsa wan yek e, lê deng û wateyên wan ji hev cuda ne.

**6.** Em peyvên li jêr bi du wateyên cuda bi kar bînin:

- Par (sala çûyî) ..........................................................................
- Par (para mirov) .......................................................................
- Ker (ajal) ...................................................................................
- Ker (mirovê deng nabihîze) ......................................................

**Têbînî:** Tîpa **“p”**yê carnan hilmî ye (hişk)  û carnan jî ne hilmî ye (nerm). Her weha tîpa **“k”**yê jî wisa ye.


## 2 BIJÎŞKÊ BISINC



### XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. Divê mirov çawa zanîna xwe bi kar bîne?
2. Navên çend kesên zana yên ku raje ji gelên xwe re kirine, bibêje.

## BIJÎŞKÊ BISINC




Helbestvanê kurd **Ehmedê Namî** dibêje:
**Bijîşkê xweş fedekar û hinermend**
**Birûska hikmeta te çû Semerqend**
**Tu fexra miletê kurdî delalo**
**Were sahtê bike derdim hevalo**

Helbestvanê kurd **Ehmedê Namî** vê helbestê li ser fedekarî, zanebûn û kurdewariya bijîşkê kurd, **Ehmed Nafiz** nivîsiye.

### Gelo Dr. Ehmed Nafiz kî ye û çi kiriye?

Dr. Ehmed Nafiz di sala 1899`an de, li Bakurê Kurdistanê li bajarê Paxir Madenê, çavên xwe li jiyanê vekirine. Bavê wî Yûsif Begê Zazî, nirxê xwendin û zanînê nas kiribû, lewra wî kurê xwe bi xwendin kir. Li bajarê Madenê û Mêrdînê, Dr. Nafiz xwendina xwe ya seretayî û navîn bi dawî kiriye û di pey re, ew ciwanê zîrek û jêhatî ji bo xwendina bijîşkiyê diçe Stenbolê. Di beşê xwe de, Dr. Nafiz gelekî zîrek bû; xwendina xwe bi rengekî serkeftî qedand û bawernameya bijîşkiyê bi dest dixe.

Piştî ku Şoreşa Agiriyê li Bakurê Kurdistanê tê tepsandin, di sala 1930`î de, Dr. Nafiz di gel birayê xwe yê biçûk (Nûredîn Zaza) berên xwe didin Sûriyeyê û ji bajarê Helebê derbasî Şamê dibin.

Dr. Nafiz li Şamê dest bi karê bijîşkiyê dike û li rex wî , karên mirovî û xêrxwazî jî dike. Li Şamê dibe serokê Civata Alîkariyê. Ew Civat, armanca wê ew bû ku alîkariya kesên xizan ên ku ji ber şer perîşan bibûn, bike. Bi vê yekê Dr. Nafiz di gel kurdên xêrxwaz, rajeyeke baş ji miletê xwe re dikir. Di pey re tê Cizîra Rojavayê Kurdistanê, li Endîwerê bijîşkgehekê vedike û nexweşiyên xelkê derman dikirin.

Lê bijîşkê kurd bi vê yekê tenê razî nebû, lewra dixwest heta hêz û şiyana wî hebe, xizmet û rajeyê bike. Vê carê bi rêya Kovara Hewarê ya ku di sala 1932`an hatibû weşandin, xwe digihîne kesên nexweş. Di beşeke taybet ji kovarê de, bersiva pirsên kesên nexweş dida û rêya dermankirinê nîşanî wan dida. Derbarê vê yekê de, **Dr. Nafiz** weha dibêje: "Di Bakurê Sûriyeyê de, ji Czîra Mîr Şeref heta rojavayê Cerablusê bi sedan gundên kurmancan û eşîrên kurmanc hene ku bê diktor in, hêj tu diktorî pê li wan deran nekiriye. Heçî nexweş dikevin bi destên tebîbên kurmancî têne dermankirin" Ji ber vê yekê Dr. Nafiz hewl dida ku bighê hemû deverên ku nexweş lê hebin û destê alîkariyê dirêjî wan bike.

Xebata vî bijîşkê rêzdar, li vir naqede, lewra li Qamişlo û Amûdê jî karê bijîşkiyê dike û êşên xelkê derman dikir. Li Amûdê bi tenê roja pêncşemê, bijîşkgeha xwe vedikir û nexweşan serlêdana wî dikir. Bi vê yekê hewl dida ku li her derê bigihêje kesên nexweş. Em dikarin bêjin ku kesayeta çê, zana û bisinc, di nav civak û gelê xwe de, her dem cihê rêz û serbilindiyê ye û bi karên qenc û baş dikare navê xwe li dîrokê binivîse.

## Wateyên Peyvan

| Peyv | Wate |
|---|---|
| **Maden** | Navê bajarekî Bakurê Kurdistanê ye. |
| **Tepsandin** | Vemirandin |
| **Şiyan** | hêz, karîn |

## Guftûgoya Waneyê

1. Ehmedê Namî di helbestê de, taybetiyên kê vedibêje?
2. Li gorî nêrîna te çima mirov baldariyê dide xwendinê?
3. Dr. Nafiz di xwendina xwe de, çawa bû?
4. Kengî Dr. Nafiz bi birayê xwe re, diçe Şamê?
5. Li Şamê çawa Dr. Nafiz raje ji gelê xwe re dikir?
6. Li kîjan bajarî Dr. Nafiz bijîşkgeh vekir:
   a. Endîwer
   b. Amûdê
   c. Qamişlo
   d. Li her sêyan
7. Çawa Dr. Nafiz bi rêya Kovara Hewarê, dikarî alîkariya nexweşan bike?
8. Mirov çawa dikare kesayetên ku raje ji miletên xwe re kirine mayinde bike?

## Hîndarî

1. Dijwateyên peyvên li jêr ji helbesta Ehmedê Namî derîne:
   **(tal, hat, derman, biçe)**
2. Di hevoka li jêr de, daçek û paşdaçekan destnîşan bike.
   **“Dr. Ehemd Nafiz di sala 1899`an de, li Bakurê Kurdistanê li bajarê Paxir Madenê, çavên xwe li jiyanê vekiriye.”**
3. Di nivîsa li jêr de cînav û gihanekan destnîşan bike:
   **“Ew Civat, armanca wê ew bû ku alîkariya kesên xizan ên ku ji ber şer perîşan bibûn, bike. Bi vê yekê Dr. Nafiz di gel kurdên xêrxwaz, rajeyeke baş ji miletê xwe re dikir.”**
4. Ji peyvên li jêr hevokeke sergihayî saz bikin:
   **(mirov, nîgarkirin, xêrxwaz, rû, girnijîn, li, hejaran)**

## Rêziman

### Navdêr

Tu hînî zimanan bibe ey ciwan
Ne tenha tu kurd î, li pêş te cîhan
Eger ko zimanên mezin zanibî
Xem û kul ji ser te bi wan radibî
Dibî rengê bilbil bi awaz û deng
Dibî payedarek bilind û çeleng
(Cegerxwîn)

1. Peyvên binxêzkirî, çi raber dikin:
   a. Kar
   b. Dem
   c. Kar û dem
   d. Navdêr
2. Çima nav li heyînan tên kirin?
3. Çi cudahî di navbera navên ajal, şînatî û mirovan de, heye?

**Navdêr**: Nav li mirov, ajal, balinde û tiştan dibin û wan bi şêweyekî giştî yan taybet destnîşan dikin.

**Nav li gorî taybetiyên heyberan:**

1. **Serenav:** Ji peyvên ku tenê heyînekê didin nasîn re, serenav tê gotin.

Mînak:

a. Azad û Gulê, giriftariyê bi hev re çare dikin.
b. Gulçîn, pir baldariyê dide, çîrokên aşopî.
» Ji her du hevokên li jor, serenavan destnîşan bike.
» Tu jî hin serenavan hilbijêrî û di hevokan de, bi kar bîne.

**2. Hevenav:** Ji navdêrên giştî yên ku ji yekê zêdetir tiştan bi nav dikin re, hevenav tê gotin.

Mînak:

a. Rola kurmikên erdê di vexepartina xakê û dana hewayê ya ji bo rehan de, pir girîng e.
b. Tîrêjên Rojê, gava li rûyê neynikê didin, yekser vajî dibin.

» Ji her du hevokên li jor, hevenavan dest nîşan bike.
» Tu jî hin hevenavan hilbijêrî û di hevokan de, bi kar bînî.

Em damikê, bi peyvên li jêr dagirin.

**(Av, Heyv, Gelawêj, Derya Spî, Amarîka)**

| Serenav | Hevenav |
|---|---|
| | |
| | |
| | |
| | |
| | |

# 3 FÎZÎYA Û KAREVA



## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. Li gorî te ev pêşketinên ku mirov gihiştiye wan, bi saya çi pêk hatine?
2. Heger mirov zanistê di karê xwe yê rojane de bi kar bîne, dê bandorek çawa li karê wî bibe?

# FÎZÎYA Û KAREVA



Eger fîzîya em nezanin çilo
Dikarin herin pêş bi xurtî gelo?

Bibe fîzîyayî, mirovek mezin
Bi te payedar bin çi mêr û çi jin

Tu sarûxê çêke, ku pir dûr herin
Ne bes fîzîyayî ji bona şer in

Resedxane deyne li kûpên çîya
Bi kêrî me tê ey bira fîzîya

Tu gewher bi zanîn ji hev perçe ke
Tu qada welatê xwe pê firçe ke

Bike hatina me bibî çarde qat
Hebûnek bizanîn felata welat

**Ser û bin bikin rewş û pergal û jîn**
**Bibin dewlemend em li royê zemîn**

**Di nav miletan  de bibin serbilind**
**Wekî hev bikin em, hemî şar û gund**

**Hemî nifşe xwendin bixwîne teva**
**Belam zêdetir fîzîya , kareva**

**Çi tiştên ku baş in bixwîne timî**
**Welatê me ronî dikin ew hemî**

**Şevan bikne wek roj û rûgeş bikin**
**Dilê xort û qîzan bi wan xweş bikin**

**Bere fabrîke xweş bi wê bêne saz**
**Di karxaneyan de bibin serfiraz**

**(Cegerxwîn)**

## Wateyên Peyvan

| Peyv | Wate |
|---|---|
| **Sarûx** | Mûşek |
| **Resedxane** | Cihê ku çavdêrî jê tê kirin. |
| **Kûp** | Lûtke |
| **Fabrîke** | Kargeh |

## Guftûgoya Waneyê

1. Mijara helbestê derbarê çi de ye?
2. Mebesta helbestvan ji xêza li jêr çi ye?
   **Ne bes fîzîyayî ji bona şer in**
3. Li gorî helbestê heger mirov baş zanista fîzyayê nas bike û bi kar bîne, dê bandoreke çawa li civakê bike?
4. Vê malika li jêr şîrove bike:
   **Tu gewher bi zanîn ji hev perçe ke**
   **Tu qada welatê xwe pê firçe ke**
5. Helbestvan dibêje: **"Şevan bikne wek roj û rûgeş bikin"** Gelo zanist çawa dikare şevê bike weke rojê?
6. Têkiliya kar û zanistê û bandora wan li hev, diyar bike û hewl bide tu mînakeke jiyanî di vê derbarê de bidî.

## Hîndarî

1. Ji helbestê hemwateya peyvên li jêr destnîşan bike:
   a. Erd:
   b. Rizgarî:
   c. Bajar:
2. Peyvên li jêr di nava hevokan de bi kar bîne:

   **Fîzya, kûp, gewher, karxane**
3. Ji helbestê malika ku wateya hevoka li jêr raber dike destnîşan bike:
   Her dem zanistên bisûd, bixwîne, ew welatan ji tarîtiyê ber bi ronahiyê ve dibin.

## Dastan

Ew cureyekî nivîsê ya wêjeyî ye; tê de lehengî û evînî serdest in. Ew bi rengekî helbestî tê hûnan û cureyekî nivîsê ya dirêj e.

Mînak: Dastana Gilgamêş, Kela Dimdimê, Mem û Zîn û hwd.

Mînakeke şîrovekirî:

Xanê Dimdim

Xano got:
"Kuro, qet xwe qels nekin
Heya we tê, hûn bi kêf şer bikin
Lêxin metirsin ji mirinê
Navê kurdan bimîne dinê"
Li hev ketin tîr rim û nize
Bûye hewar û bû hêwirze
Mêrxasên Xano hindik û kêm
Di nav cengê de dêm dane dêm
Xwîna wan rijî û hat xwarê
Wek ava çemên derbiharê
Dimirin bi mêranî û kurdî
Li ber destê Şah nabin girtî

Ev kurteparçeyeke ji" Dastana Kela Dimdimê" ye. Tê de, lehengiya Xanê lepzêrîn û berxwedaniya keleha wî, li hember Şahê Sefewî diyar dike. Ew xwe û kelaha xwe bi hêsanî nade destê neyaran û bi mêranî heta kêliya dawî, li ber xwe dide. Piştî ketina kelehê, dayîka Xanê Lepzêrîn, xwe digihîne bargeha kelehê û dijmin di hundirê kelehê de, disoje.

### Derbirîn

1. Kar û zanist hev temam dikin û li pêş dixin. Rola bipêşketinên zanistî di warê hêsankirina jiyana mirovan de, pir heye. Di derbarê vê rolê de, mijareke kurt binivîse.
2. Sinc birêkûpêkiyê dide kar û jiyanê hêsan dike. Derbarê rastgotinê û bandorên wê li têkiliyên mirovan, mijarekê binivîse.

Em ji her du derbirînên li jor derbirînekê hilbijêrin û binivîsin.

# BEŞA ÇAREM

## ÇAND Û HUNER

1. Girîngiya Hunerê li Cem Kurdan
2. Cilûbergên Kurdî
3. Koçerî

# Armancên Beşê

**Di dawiya vê beşê de, ji xwendekar tê pêşbînîkirin ku bikaribe:**

1 Waneyan bi rengekî dirust û tekûz bixwîne.

2 Rol û girîngiya huner, cilûberg û koçeriyê, di çanda kurdan de, nas bike.

3 Wateyên peyvên nû nas bike û wan peyvan di nivîsên xwe de, bi kar bîne.

4 Navên şênber û razber ji hev nas bike û di derbarê wan de, mînakan bide.

5 Cînavên kesane yên xwerû û tewandî û qertafên cînavên xwerû nas bike û di derbarê wan de, mînakan bide.

6 Demên borî (têdeyî, berdest û dûdar) nas bike û di derbarê wan de, mînakan bide.

7 Helbestê nas bike û wê ji cureyên nivîsên wêjeyî yên din, cuda bike.

8 Di derbarê mijara beşê de, bi rengekî wêjeyî û xweş hest, raman û nêrînên xwe, weke mijar derbirîne.

# 1 GIRÎNGIYA HUNERÊ LI CEM KURDAN



## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. Em çi navî li kesên stranbêj, muzîkjen .... dikin?
2. Li mal, tax an gundê we kesên hunermend hene?
3. Tu ji kîjan cureyê hunerê hez dikî?

# GIRÎNGIYA HUNERÊ LI CEM KURDAN



Ji demên kevn ve, mirovan ji bo raberkirina hest û daxwazên xwe, gelek rêbaz bi kar anîne.

Yek ji van rêbazan jî ku bandoreke wê ya mezin heye û li cem gelek civakan peyda dibe jî huner e. Huner di navbera civakan de, mîna zimanekî hevbeş e ku sînoran nas nake û cihê xwe di nava dilê her kesî de, digire.

Kurdan jî girîngiyeke pir mezin daye hunerê û bi hezaran stranbêj, helbestvan, neqşevan û hwd di nava kurdan de derketine. Bê guman kesên hunermend di civaka kurd de gelekî binirx û hêja ne.

Dibêjin ku Mîrê Botanê, gelekî ji mirovên zana, hunermend û afrîner hez dikir û ew li cem wî pir bi rûmet bûn; her dem dixwest ku ev mirov li civata wî amade bin û berhemên xwe pêşkêş bikin. Beramberî vê yekê, mîr bi diyariyan ew xelat dikirin. Ji ber ku mîr baş dizanîbû ku karên bi vî rengî nîşana şarezayî û pêşketinê ne, cihê van kesan li cem wî pir bilind bû.

Carekê mîr ristevan, tembûrvan û neqşevanekî vedixwîne dîwana xwe. Mîr bi gotineke nerm û bê ku mîrîtiya xwe nîşan bide ji mirovê tembûrvan re got: "Ez dixwazim ku tu awazeke xweş biafirînî û lê bidî." Paşê ji yê ristevan re jî got: "Ez dixwazim tu ji min re risteke xweş bihûnî û bibêjî." Her weha ji yê neqşevan re got: "Dixwazim tu wêneyekî ji min re bineqşînî. Piştre her yek ji we xelateke binirx distîne û karê kê ji we, di ser karê yê din re be, ez ê vê taca zêrîn bidim serê wî." Piştî demekê ji kar, her sê hunermend ji bo pêşkêşkirina karên xwe, li dîwana mîr civiyan. Pêşî mirovê tembûrvan sazeke pir tenik û xweş ku reh û damarên mîr di laşê wî de lebitandin, lê da. Piştre mirovê ristevan jî risteke bi kêşe û wate û salixên xweş û bi naverokeke wêjeyî ku kêşe û tîpên wê weke sazê çingînî jê dihat, xwend. Ji kêfan re mîr jê xwest ku careke din dubare bike. Mirovê neqşevan jî li ser latekî hilû wêneyê pezkoviyekî ku bi ava zîvî xêzên wêneyê hatibûn teyisandin, jê re nîgar kiribû. Mîr ji kêfan re wêne ji destê wî digire û bi dîwana xwe vedike. Mîr êdî mat dimîne ku tacê bide serê kê!

Hîn mîr di vê matmayîbûna xwe de bû, ji nişkan ve pîrejinek derbasî dîwanê bû û bê destûr rahişte tacê û li ser serê xwe danî. Xulamê mîr bi hêris bi ser pîrejinê de qîriya û got: "Ev çi bêtoretî ye ku te kir? Ma ev tac ya ku tu bidî serê xwe?!" Pîrejinê bi payedarî lê vegerand û got: "Belê, ji ber ku ev her sê mirovên hunermend kurên min in!" Wê demê mîr pir şad û dilxweş bû û got: "Tac taca pîrê ye layiq û xurdeyî serê wê ye."

**(Ji folklora kurdî, berhevkirina helbestvan Salihê Heydo)**

## Wateyên Peyvan

| Peyv | Wate |
|---|---|
| **Ristevan** | Helbestvan |
| **Salix** | Gotin |
| **Vexwendin** | Dawetkirin |
| **Teyisandin** | Çirisandin |
| **Hilû** | Şayîk |
| **Tore** | Edeb |
| **Payedarî** | Jixwerazîbûn |

## Guftûgoya Waneyê

1. Li gorî mîr hunermend nîşana çi ne?
2. Mîr çawa nêzî hunermendan dibû?
3. Mîr çi bi nîgara neqşevan kir?
4. Di nêrîna te de, çima mîr ji hunermendan xwest ku her yek berhemekê biafrîne?
5. Xelata mîr ji bo hunermendan amade kiribû, çi bû?
6. Çima mîr mat ma ku tacê bide serê kê?
7. Di nêrîna te de hebûna sê hunermendan di malekê de, nîşana çi ye?
8. Gelo herî zêde kîjan cureyê hunerê bala te dikşîne û tu çawa hewl didî ku xwe di vî warî de li pêş bixî?

## Hîndarî

**1.** Em ji her peyvekê re, du hemwateyan binivîsin:

Mîr ............... ..................

Raber ............... ..................

**2.** Em van gotinan (şanazî, dilxweşî, kêmkirin û tinazî) li rex hevoka ku heman hestî dihundirîne, binvîsin:

**a.** Mîr ji kêfan re wêne ji destê wî girt û bi dîwana xwe vekir. (      )

**b.** Ev çi bêtoretî ye ku te kir? Ma ev tac ya ku tu bidî serê xwe? (      )

**c.** Belê, ji ber ku ev her sê mirovên hunermend, kurên min in! (      )

## Rêziman

Li gorî hestkirinê navdêr

**1.** Li gorî hestkirinê, em navdêrên li jêr dabeş bikin:
kevir, xeyal, kîn, qencî, zêr, pênûs, mase, dar, xemgînî

| Bi her pênc lebatan tê hestkirin. | Bi her pênc lebatan nayê hestkirin. |
|---|---|
| | |
| | |
| | |
| | |
| | |

**Navdêrên şênber:** Ew nav in ku mirov dikare bi her pênc lebatên hestkirinê, wan destnîşan bike.

**2.** Em navên li jêr bi rêya çi lebatê dikarin hest bikin?

| | |
|---|---|
| Çav | Hêlm |
| Poz | Sêv |
| Dest | Muzîk |
| Guh | Şêrîn |
| Ziman | Rengê kesk |

**Navdêrên razber:** Ew nav in ku mirov nikare bi her pênc lebatên hestkirinê wan destnîşan bike; ew girêdayî raman û hizirîna di hişê mirov de ne.

**Mînak:** aşop, hizir, sinc, hezkirin …

**1.** Em valahiyên li jêr bi navên razber dagirin:

Di hizir û ……….. min de, gelek aşop hene.

Mirov nikare ………….. bi destan bigire.

Di dilê min de,…………pir xurt heye.

Xeyal û ……………li gel wî kêm in.

**2.** Em peyvên li jêr di hevokan de, bi kar bînin:

Kêfxweşî:……………………………………………………..

Kîn:…………………………………………………………...

Bawerî:…………………………………………….……

# 2 CILÛBERGÊN KURDÎ



## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. Cilûbergên hemû miletan mîna hev in an na?
2. Te qet cilên kurdî li xwe kirine, ew çawa ne?
3. Tu dixwazî cilên kurdî li xwe bikî û çima?

# CILÛBERGÊN KURDÎ



Cîhana me mîna baxçeyekî rengîn e ku di nava wê de gelek milet û netewe mîna gulên renge-reng hene û her yek bi ziman û çanda xwe tê nasîn û çêjeke cuda dide jiyanê. Jixwe yek ji taybetiyên ku miletan ji hev cuda dike û çand û awayê jiyana wan raçav dike, cilûberg in. Her çiqas cilûberg ji bo xweparastina ji serma û germayê hatibin bikaranîn jî lê heger mirov baş bala xwe bide wan, dê dîrok, xwezaya welat, bawerî û awayê jiyana civakekê, nas bike.

Di çanda kurdî de, cilûberg cihekî berz digrin û bi bedewî û spehîbûna xwe tên nasîn û ew ji kurdan re bûne mîna zanavekî. Ev yek jî di wêjeya kurdî de, bi taybet di stranan de belî ye ku gelek caran stranbêj xeml û xweşikbûna cilan, diyar dike, mîna strana Xeftano, Çoxê Mino û hwd.

Cilûbergên jina kurd bi reng û terzê xwe pir ciyawaz in. Ev cil jî di rengê xwezaya Kurdistanê de ne. Her weha girêdaneke xurt a van

cilan bi mîtaniyên ku dibin pêşiyên kurdan ve, heye. Heger mirov baş li cilê jina kurd temaşe bike, dê bibîne ku ew ji gelek aliyan ve mîna perê kevokê ye. Ev yek jî girêdana bi mîtaniyan ve ku nîgara kevokê nîşana wan bû, dide diyarkirin.

Cilên mêrê kurd jî girêdayî çiya û lawirên xurt ên li Kurdistanê ne. Li tavahiya welat cilûbergên mêrê kurd weke hev in, ji bilî hin herêman ku li gorî xwezaya wan, hinek guhartinên piçûk di wan de çêbûne. Parçeyên sereke yên cilûbergê mêrê kurd ev in: şal û şapik, şerwal û kurtik, şûtî û piştwîn, kum û koloz û kejî û dersok.

Cilûbergên mêrê kurd jî di teşeyê pilingê bihêzd de ne; şûtik û piştwîna reş mîna xêzên li pişta piling e û firehbûna şal jî mîna ranên piling in. Her weha dersok û kejiya mêrê kurd, çiyayê Kurdistanê nîşan dide û kumê gewr jî mîna qotê çiyê yê biberf e. Her weha gul û pitikên di kejî û dersoka serê wî de xwezaya Kurdistanê nîşan dide.

Ji bilî van jî li herêmên deştî mêrên kurd, kirasê gewr û bihûçik, qutik, derpê û kumê tûjik jî li xwe dikirin.

Bêguman ev cil jî xwedî peywir û wateyên cuda ne, bi taybet ku li herêmên deştê germahî zêde ye, kirasê gewr tê bikaranîn. Her weha kumê tûjik her çiqas ber bi jor ve be, ewqas nêzîkbûna ji Xweda nîşan dide û çarguliyên girêdayî, ew ji zerdeştiyê hatine û tên wateya hebûna Xweda li herçar aliyan. Her weha çar hêmanên sereke yên jiyanê di rêgezên felesfeya zeredştî de (av, ax, ba û agir) nîşan dinin.

Her çiqas ji hêla dagirkeran ve şerê van cilan hatibe kirin û lixwekirina wan qedexe bûbe û tenê di rojên cejn û boneyan de, sînordar bûbe jî, lê ew her dimînin xelekeke zêrîn ji rêzexelekên çanda kurdî. Gelê kurd di boneyên mîna Roja Jinê, Cejna Newrozê û hwd de van cilan li xwe dike û wan ji nû ve vedijîne. Her weha 10`ê meha adarê weke Roja Cilûbergên Kurdî ji aliyê gelê kurd ve, tê pîrozkirin. Ev roj bi lixwekirina cilûbergan û bi xemleke xweşik, weke rojeke xwedîderktina li van cilan, ji aliyê gelê kurd ve bi kêf û xweşî, tê pîrozkirin.

## Wateyên Peyvan

| Peyv | Wate |
|---|---|
| **Çêj** | Hestê ku bi ziman tê hestkirin (şor – şêrîn – tal – tirş). |
| **Raçav** | Aşkere |
| **Terz** | awa, teşe |
| **Nîgar** | Nexşe |
| **Ran** | Hêt |
| **Bone** | Helkeft |
| **Zanav** | Nasname |

## Guftûgoya Waneyê

1. Çi girîngiya cilûbergan heye?
2. Bi kurtasî dabaşa cilê jina kurd bike.
3. Cilê mêrê kurd di teşeyê çi de ye?
4. Navên çend parçeyên cilê mêrê kurd binivîse.
5. Bilindbûna kumê tûjik nîşana çi ye?
6. Roja cilûbergên kurdî kengî ye? Tu vê rojê çawa pîroz dikî?
7. Hin mirov ji ber lixwekirina cilûbergên kurdî şerm dikin û wan napejirînin. Tu ji bo wan çi dibêjî?
8. Li gorî te çima dagirker dixwazin cilûbergên kurdî ji holê rakin?

## Hîndarî

**1.** Em ji peyvên li jêr, peyva ku wateya wê cuda ye, destnîşan bikin:
(qot – qut – lûtke)
(çek – cil – kinc)
(berz – baz – bilind)

**2.** Em peyvên li jêr di nava hevokan de, bi kar bînin:
Cilûberg:
Şerwal:
Xeml:

**3.** Em her yek ji peyvên li jêr, li rex hevoka ku wê raber dike binivîsin:
(rastî – aşop – nêrîn)

**a.** Cilê jina kurd mîna keskesoreka ku asîman dixmilîne, bedewî û rengîniyekê dide derdorê. (      )

**b.** Li gorî min di cîhanê de, cilên kurdî yên herî xweşik in. (      )

**c.** Cilên kurdî girêdayî xwezaya Kurdistanê ne. (      )

## Rêziman

### Cînav

**Ey Welat**

**Ey welat im can bi gorî gazina te j` min nebî**
**Tu dizanî bi şev û rojan ez xemxwarê te me**
**Rêz û neqşê xameya min navê tey şêrîn û xweş**
**Her wekî bilbil dinalim ez pesindarê te me**
**Ger hemû kes aşiqê malê dinê çavên reş in**
**Ez evîndarê çiya û deşt û zinarê te me**

**( Seydayê Tîrêj)**

1. Di malika yekem de, peyvên "te û min", cihên çi girtine?
2. Di malika duyem de, peyva "tu" cihê çi girtiye?
3. Di malika dawî de, peyva "ez", cihê çi girtiye?

**Cînav:** Ew bêje ne ku li şûna navdêran tên bikaranîn, erk û ristên wan pêk tînin.

**Em hevokên li jêr bixwînin û cînavan destnîşan bikin û di pey re, wan di tabloyê de, bi cih bikin:**

- Her roj ez diçim gulîstanê.
- Tu ji şînatiyan hez dikî?
- Li gorî agahiyan, ew ji Hewlêrê tê Qamişloyê.
- Ew pir dixwînin.
- Hûn jî beşdarî dewreyên teknîkî bibin.
- Em pir ji lîstikên cîhanî hez dikin.

**Cînav**

...............

...............

...............

...............

...............

..............

1. Em çi navî dikarin li van cînavan bikin:
   - a. **Cînavên şanîdanê**
   - b. **Cînavên kesane**
   - c. **Cînava vegerok**

**Cînavên kesane:** Ew cînav in ku cihên kesan digirin.

Em hevokên li jêr bi cînavên guncaw dagirin:

............. ji bo dibistana xwe, pir xebatê dike.

............... ji nûderînên nû hez dikim.

............... ji ber vê yekê, sergeşte tev digerin.

**Cînavên kesane dibin du cure:**

1. Cînavên kesane yên xwerû:

| Cînavên kesane yên xwerû | Hevok |
|---|---|
| Ez | Ez pir ji nivîsa mijaran hez dikim. |
| Tu | Tu her gav xwe rahênan dikî. |
| Ew (yekjimar) | Ew navên gelek pirtûkan dizane. |
| Em | Em tev ji werzişê hez dikin |
| Hûn | Hûn hêviya me ne. |
| Ew (pirjimar ) | Ew çûn bazarê. |

**2.** Cînavên kesane yên tewandî:

| Cînavên kesane yên tewandî | Hevok |
|---|---|
| Min | Min ji hevaltiya te gelek sûd wergirtin. |
| Te | Te her gav rêya rast nîşanî me dikir. |
| Wî | Wî bi xebata xwe, jiyana me hêsan kir. |
| Wê | Wê bi dengekî zelal, stran digotin. |
| Me | Me bergiriyên hêja, girtine. |
| We | We gelek mijar gotûbêj kirine. |
| Wan | Wan aşê gund, çaksaz kir. |

**Rêgez**

Ji her cînaveke xwerû re, qertafeke kesane heye; ew qertaf li pey navdêr, hevalnav, lêkeran ... tên.

| Cînav | | Qertafên kesane | | Qertafên kesane |
|---|---|---|---|---|
| Ez | | Ez karker im | | Ez zana me |
| Tu | | Tu karker î | | Tu zana yî |
| Ew | **Karker** | Ew karker e | **Zana** | Ew zana ye |
| Em | | Em karker in | | Em zana ne |
| Hûn | | Hûn karker in | | Hûn zana ne |
| Ew | | Ew karker in | | Ew zana ne |

Em peyvên li jêr bi cînavên kesane yên xwerû re bikşînin û qertafên kesane destnîşan bikin:

(çûn, xwendin, çavreş)

.......................................................................................

.......................................................................................

.......................................................................................

# 3 KOÇERÎ




## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. Gelo li hemrêma we çi cureyên lawiran hene?
2. Pez bi piranî li kîjan herêman tê dîtin?
3. Kesên ku mijûlî xwedîkirina pez dibin, em çi navî li wan dikin?

# KOÇERÎ



Roj û Helezê serdana mala dapîr û bapîrê xwe kir. Bi coşeke mezin dapîr û bapîrê wan, ew pêşwazî kirin. Li ser mêzeyê albomeke rengîn hebû, lewra Roj û Helezê bi destûr daxwaza temaşekirina li elbomê kir. Dapîr, bapîr, Roj û Helez li dora mêzeyê rûniştin û bi aramî li wêneyan temaşe kir. Li gel bapîr û dapîrê ji her wêneyekî re çîrokek hebû û bi dilxweşî ew tanîn ser ziman. Helezê pirsî, bavo! We ev wêne  li ku girtiye?

Bapîr: Ev wêne li Çiyayê Kizwanan (Çiyayê Ebdulezîzê) hatiye girtin. Em li wê herêmê koçer bûn.

Roj: Koçerî çi ye?

Bapîr: Di wan deman de, em li gund dijyan, lewra me debara xwe bi xwedîkirina sewalan dikir. Di dawiya meha sibatê û destpêka meha adarê de, bi seba dabînkirina çêrgeheke guncaw ji sewalan re, me berê xwe dida cihên cuda. Mînak: Çiyayê Kizwanan, Hol, beriya Dêra

Zorê … Ji vê koçkirina demkurt a ji bo dabînkirina çêreyê ji sewalan re, koçerî tê gotin û beriya çûnê bi çend rojan me amadekariyên xwe dikirin.

Helezê ji dapîra xwe pirsî: We çawa amadekariyên vê koçeriyê dikirin?
Dapîr: Destpêkê me kesek an du kes ji bo hilbijartina cihê guncaw, bi rê dikirin. Navê wî kesî yan wan kesan, wardoz bû. Me jî li malê konê koçeriyê çaksaz dikir. Heger hin cih qetiyayî yan rizyayî hebana, me ew ji nû ve ji bo bikaranînê, çak dikirin. Paşê me hemû pêdiviyên koçeriyê amade dikirin. Mîna werîs, darên bêriyê, beroş û meşk ... her weha me tibabeke baş ji ardûyê qurm û daran ji bo şewatê, amade dikir. Di dema çûnê de, me hemû alav û pêdiviyên xwe li erebeya darîn dikirin û bi rê diketin. Di pey re, keriyê pez jî bi serdariya şivan bi rê diket. Pez dûrêzî hev dibû û di rê û xaçirêkan de, dibûriya. Ev rêwîtî demkurt bû; carnan rojekê û carnan jî du rojan berdewam dikir û paşê em digihan cihê destnîşankirî.

Roj: Bavo gava hûn digihan cihê destnîşankirî, hûn çawa tev digeriyan?

Bapîr: Gava em digihaştin cihê koçeriyê, me cihê vegirtina kon destnîşan dikir; divyabû cihê vegirtina kon nêzî kaniyê yan cihekî biav ba. Mîna: bîr, cobar, gol … Paşê, şivan pez dikşand nav çêreyê û pez, ravedida (bi rêk û pêk dibû).
Helezê berê xwe da dapîra xwe û pirsî: Dayê, hûn li koçeriyê weke jin bi çi karî radibûn?

Dapîr: Danê sibehê dema pez vedgeriya cihê destnîşankirî, me bêrîvantî dikir.

Roj bi mereqdarî got: Bêrîvantî çi ye?

Dapîr gernijî û got: We ev kar nedîtiye kurê min! Dema pez vedigere; em dibêijn pez hat bêriyê û ji jina ku pez didoşe re jî bêrîvan tê gotin.

Paşê şivan û dûşivan (kesê pez bi dû şivan ve, diajo) pezê xwe dikşand nava çêreyê û heta danê êvarî careke din kerî vedigere bêriyê.

Roj û Helezê bi van agahiyan ketin nava deryayeke ji aşop û xeyalên xweş, lewra bi dilekî germ xweziya xwe bi wê yekê anîn ku wan jî ew serborî jiyaba.

## Wateyên Peyvan

| Peyv | Wate |
|---|---|
| **Wardoz** | Kesê ku li cihekî guncaw ji bo hilbijartina çêrgehê digere. |
| **Meşk** | Alava ku bi rêya wê mast dibe nîvişk. |
| **Tibab** | Qase |
| **Ardû** | Êzing |
| **Erebeya Darîn** | Erebeya ku ji daran saz bûye. |
| **Xaçirêk** | Rêyên zirav ên ku pez di wan re dibuhire. |
| **Cobar** | Rûbar an ew şaxên avê yên ku tevlî çemên mezin dibin. |

## Guftûgoya Waneyê

1. Li mala dapîr û bapîr, çi bala Roj û Helezê kêşa?
2. Gelo di dema me ya niha de, li Çiyayê Kizwanan koçerî dibe?
3. Kesên ku li gundan dijîn, çawa debara xwe dikin?
4. Beriya ku koçer bi rê biketana, kî li pêşiya xwe bi rê dikirin?
5. Beriya koçer bi rê biketana, çi amadekarî dikirin?
6. Gava koçer digihan çihê destnîşankirî, çawa tev digeriyan?
7. Bêrîvantî çi ye?
8. Li gorî têgihiştina xwe, vê waneyê bi devokî û bi rengekî kurt bîne ziman.

## Hîndarî

**1.** Em sembola (√) li hemberî agahiya rast û sembola (×) li hemberî agahiya şaş xêz bikin:

**a.** Di wan deman de, em li bajaran dijiyan, lewra me debara xwe bi xwedîkirina sewalan dikir. (     )

**b.** Destpêkê me kesek an du kes ji bo hilbijartina cihê guncaw, rê dikirin. (     )

**c.** Pez bi komî di rê û xaçirêkan de, dibûriya. (     )

**2.** Em valahiyên li jêr bi peyvên guncaw dagirin:

Roj û Helezê bi van .......... ketin nava deryayeke ji aşop û xeyalên ........., lewra bi dilekî germ ............. xwe bi wê yekê anîn ku wan jî ew serborî jiyaba.

**3.** Em peyvên li jêr di nava hevokan de, bi kar bînin:

(koçer, demkurt, kerî, wardoz, şax)

**4.** Em dijwateyên peyvên li jêr binivîsin:

| Peyv | Dijwate |
|---|---|
| Pêş | ................ |
| Demdirêj | ................ |
| Vegerîn | ................ |

## Rêziman

### Dem

Zîn çû mala bapîrê xwe.

Reşo pir ji lîstika şetrencê hez kir.

Rûken zû raket.

1. Gelo çûna Zînê ya mala bapîrê wê, kengî pêk hatiye:
   a. Dema bûrî
   b. Dema niha
   c. Dem bê
2. Gelo Reşo di kîjan demê de, ji lîstika şetrencê hez kir:
   a. Dema bûrî
   b. Dema niha
   c. Dem bê
3. Gelo Rûken kengî raket:
   a. Dema bûrî
   b. Dema niha
   c. Dem bê

**Li gorî te, karên dema bûrî beriya axaftinê yan di dema axaftinê de, pêk tên?**

**Dema bûrî:** Ew kar in ku bûyîna bûyerên wan, berî dema axaftinê, rû daye.

**Em çîroka li jêr bixwînin û peyvên ku dema bûrî, raber dikin destnîşan bikin:**

## Ji bo xwe direvim

Rojekê tajiyekî bera dû kevroşkekê dida. Tajî dikir û nedikir nedigha kevroşkê. Li bayê bezê tajî ev pirs ji kevroşkê kir: "Ez tajiyê nêçîrê me, ji her kesî bezatir im; çima ez dikim û nakim nagihêm te?" Kevroşkê lê vegerand û got: "Ez ji bo xwe direvim û tu jî ji bo nêçîrvan direvî."

» Em peyvên li jêr li gorî dema bûrî bikşînin û hevokan ji wan saz bikin:

**raxstin, ristin, birêveçûn**

**Dema bûriya têdeyî (nêz):**

Em ketin nav zeviyên cotkirî.
Ez hatim nava hevalên xwe.
Hûn çûn gel mamoste?

1. Lêkerên (ketin, hatin û çûnê) di kîjan demê de, rû daye?
2. Gelo ew kar bi dawî bûne yan na?

**Dema bûriya têdeyî:** Ev dem kar û bûyerên ku di demeke diyar de, pêk hatibin û bi dawî bûbin, diyar dike.

Mînak:
Ez bi hevalên xwe re geriyam.
Ew bi mamosteyê xwe re ……………
Tu ………. ber dergehê wan.
…………………………………………

**Dema bûriya berdest:**

**Şevger li kolanan digeriya.**

**Masîgir bi şev diçû nêçîra msiyan.**

**Pirs**

1. Şevger kengî li kolanan digeriya:
   a. Dema bûrî
   b. Dema niha
   c. Dema bê
2. Gelo carekê yan pir caran Şevger li kolanan digeriya?

**Dema bûriya berdest:** Dema ku bûyerek di dema bûrî de, bi domdarî hatibe kirin, ev dem tê bikaranînin.

Mînak:

a. Zozan, li gulên baxçeyê dibistanê temaşe dikir.

b. ........................................................

c. ........................................................

3. Em valahiyên li jêr bi lêkerên bûriya berdest, dagirin:

a. Wî hêvî ............ ku bibe nojdarekî serkeftî.

b. Ji bo paqjiyê ew li alavan ...............

c. Wê ................ lê, hevalên wê ne ..................in.

## Helbest

Ji nivîsên ku hest, raman û aşopan bi awayekî ahengî; bi teşeyê xêzan vedibêjin re, helbest tê gotin.

Mîank:

Destê xwe bavêje xame   xondin û dilpaqijî
Çêke jîn û deng û name   da nemînî berdizî
Bo dilê te şewq û cam e   nû dike canê rizî
Pesn û zanîn û selam e   derdixîne qurmizî

**(Ehmedê Palo)**

**Em bira ne**
Em bira ne xortê kurd in
Tev dixwînin yek ziman

Em tev mêr in tev jî merd in
Daxwaza me Kurdistan

**(Seydayê Tîrêj)**

## Derbirîn

Mîna hemû gelên cîhanê, gelê kurd jî xwedî çand,  huner û wêjeyeke serbixwe û dewlemend e.

Tiştên ku kurd bi wan mijûl dibin û awayê jiyana wan, taybetiyeke ciyawaz li neteweya kurdî bar dikin.

Cureyeke hunerê li cem kurdan bigire dest û di derbarê wê de mijarekê binivîse. (stranbêjî, çêrokbêjî ...)

Hewl bide ku tu mijara xwe bi biwêj û gotinên pêşiyan dewlemend bikî.

# BEŞA PÊNCEM

## Welat

1

Geştyarî

2

Gola Ûrmiyê

3

Rojhilatê Kurdistanê

# Armancên Beşê

**Di dawiya vê beşê de, ji xwendekar tê pêşbînîkirin ku bikaribe:**

1. Waneyan bi rengekî dirust û tekûz bixwîne.
2. Bi rengekî giştî Rojhilatê Kurdistanê, nas bike.
3. Bi rengekî giştî geştyariyê û cihên geştyarî li welat nas bike.
4. Wateyên peyvên nû nas bike û wan peyvan di nivîsên xwe de, bi kar bîne.
5. Dema niha û qertafa wê nas bike û qertafên kesane bi bîr bîne û lêkeran li gorî dema niha bikşîne.
6. Efsaneyê nas bike û wê ji cureyên nivîsên wêjeyî yên din cuda bike û navên hin efsaneyên kurdî, nas bike.
7. Di derbarê mijara beşê de, bi rengekî wêjeyî û xweş hest, raman û nêrînên xwe, weke mijar derbirîne.

# 1 GEŞTYARÎ



## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. Ji bo derbaskirina demeke xweş an jî ji bo naskirina hin cihan, te qet serdana bajarên navdar kiriye?
2. Li bajar an jî gundê we, cihên ku gel serdana wan dike hene û navên wan çi ne?
3. Gelo tu dizanî geştyarî çi ye û çawa ye?

# GEŞTYARÎ



Di dema bêhinvedan û betlaneyan de, gelek mirov ji bo standina vehesînekê û dûrketina ji fişara kar, her weha ji bo naskirina herêm, çand û zimanên din, serdana deverên ku bi çem, çiya, derya û şûnwarên xwe navdar in, dikin. Ji ew gera ku mirov ji bo kêfxweşiyê yan jî ji bo vedîtina cihekî din dike re, geştyarî tê gotin. Her weha, geştyarî komeke çalakiyên şaristanî, çandî û aborî ye ku kes ji bajarekî ber bi bajarekî din ve, yan jî ji welatekî ber bi welatekî din ve, diçe.

Geştyarî hem ji bo kesayetê bixwe, hem jî ji bo civak û welatan jî xwedî girîngiyeke mezin e. Mirov bi rêya wê dikare kêliyên xweş derbas bike, ev yek jî bi rengekî erênî bandorê li derûniya mirov dike û fişar û zexta jiyanê li ser kêm dike. Her weha derfeta naskirina çand, ziman û dîroka gelek civakan li ber kesê geştyar vedike. Ev yek hem ji bo kesê geştyar û hem jî ji bo welatê ku geştyarî li pêk tê, dewlemendî û sûdeke mezin e.

Li welatekî her çiqas tevgera geştyariyê li pêş be, ewqas derfet ji bo pêşketina aboriya wî welatî vedibin. Her weha geştyarî tevgera avakirinê jî dide pêş; bi sedan otêl û avahî tên avakirin û derfeta karkirinê ji gelek mirovên wî welatî re, peyda dike.

Geştyarî di nava xwe de gelek cureyan dihundirîne, mîna:
Geştyariya ji bo kêfxweşiyê: Mirov bi armanca bidesxistina kêfxweşiyê û derbaskirina demeke xweş, bi vî cureyê giştyariyê radibe.

Geştyariya çandî: Ev cure bi serdana cihên dîrokî, muzexane û şûnwaran pêk tê. Di rêya wê re mirov dikar çand û hunera wî gelî nas bike.

Geştyariya olî: Di vî cureyî de, geştiyar serdana cihên olî yên pîroz dikin.
Ji bo balkişandina geştyaran, pêdivî bi hin xebatan heye ku divê ji aliyê welatê ku geştyar serdana wî dikin ve, bên kirin. Mîna peydakirina cih, xwarin û hemû pêwîstiyên geştyaran bi rengekî baş. Lidarxistina projeyên bipêşxistina geştyariyê. Her weha aramî û rêzgirtina bawerî û ayînên geştyaran jî girîng in.

Li cîhanê, Tac Mehel li Hindistanê, Birca Îvilê li Firansayê, Kolosyoma Romayê, Pîramîdên Misrê û Sûra Çînê, hin cihên geştyariyê yên navdar in.

Li Kurdistanê jî binçîneyeke guncaw ku geştyarî li ser ava bibe û li pêş bikeve heye. Kurdistana ku bi çem, çiya, kanî û darên xwe weke tabloya wênesazekî ye, bi reng û xemla xwe ya ciyawaz bala beşeke mezin ji geştyaran dikşîne. Ji bo geştyariyê, li rojhilat Textcemşîd, Pirsepolîs, li rojava Keleha Nebîhûrî, Orkêş, li bakur, Xerabreşk, Çemê Xalan û li başûr jî herêmên mîna Şkefta Şanîdarê, Keleh û Muzexaneya Hewlêrê û Şeqlawa weke baştirîn nimûne ne ku salane bi hezaran kes serdana wan dikin.

Li gorî Desteya Geştyariyê li başûrê Kurdistanê, di salên borî de rêjeya geştyarên ku tenê ji Iraqê derbasî başûrê Kurdistanê bûne, gihaştiye du milyon kesî. Her weha li gorî hin amaran, sûda diravî gihaştiye zêdetirî milyar dolarî û derfetên kar ji bo gelek kesan, hatine peydakirin.

## Guftûgoya Waneyê

1. Geştyarî çi ye?
2. Çima mirov bi geştyariyê radibin?
3. Çi sûdên geştyariyê ji bo mirovan hene?
4. Geştyarî çawa bandorê li aboriya welatan dike?
5. Bi kurtasî dabaşa geştyariya çandî bike.
6. Navên çend cihên ku bi geştyariyê navdar in, binivîse.
7. Heger derfeta geştyariyê ji te re çêbibe, tu yê serdana kîjan bajarê Kurdistanê bikî û çima?

## Hîndarî

**1.** Em peyvên li jêr di nava hevokan de bi kar bînin:

Geştyarî:

Muzexane:

Şaristanî:

Proje:

**2.** Em hemwateya rast ji peyvên li jêr re, hilbijêrin:

Amar: (hiljimar - temen - saman)

Dirav: (berav - pere - şûnwar)

**3.** Em her gotinekê li rex hevoka ku wê raber dike binivîsin:

(nêrîn - aşop - rastî)

- Ji bo geştyariyê, bajarê Amedê xweştirîn bajarê Kurdistanê ye. (          )
- Geştyar mîna refên kewan berê xwe didin bajarê Hewlêrê. (          )
- Pîramîdên Misrê yek ji cihên geştyarî yê cîhanî ye. (          )

## Rêziman

### Dema niha

1. Em hevokên li jêr bixwînin û paşê bersivê bidin:
   a. Ez ji cihên dîrokî hez dikim.
   b. Ew hêdî hêdî waneyên xwe dubare dike.
   c. Mizgîn gulan av dide.
   d. Cotyar erdê dikole.
2. Lêkerên binxêzkirî kîjan demê radigihînin:
   a. Dema bê
   b. Dema bûrî
   c. Dema niha
3. Di navbera peyvên binxêzkirî de, çi hêmanên hevbeş hene?
4. Em valahiyên li jêr bi karên dema niha dagirin:
   a. Hevend ji stêrknasiyê pir …………..
   b. Ew bi lîstokên kevn ên mîna dama û şetrencê …………
   c. Deryager li gelek welatan ………. û dibin xwedî serborî.

**Ji kar û tevgerên ku di dema vegotinê de, tên kirin re, dema niha tê gotin.**

Qertafa dema niha **"di"** ye û bi alîkariya wê û qertafên kesane, dema niha tê bidestxistin.

**Mînak:**

Ew **di**ç**e**

**Qertafa dema niha** **Qertafa kesane**

Hûn **di**xw**in**

**Qertafa dema niha** **Qertafa kesane**

Ez dikevim

.................. ..................

Em lêkerên li jêr li gorî dema niha di hevokan de, bikşînin:

**xwendin, çêkirin, xwestin, ketin**

..........................................................................................

..........................................................................................

..........................................................................................

..........................................................................................

..........................................................................................

.

# 2 GOLA ÛRMIYÊ



## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. Ji navên li jêr, navên du golan destnîşan bike:
   a. Ferat  b. Ûrmiye
   c. Dîcla  d. Wan
2. Tu ji serdana cihên nû hez dikî?

# GOLA ÛRMIYÊ



Bê welat nabe
tu carî xweş jiyan
Bê xezalokên Gebarê
Hirç û koviyên çiyan

Şax û deştên vî welatî
Her buhar e tim biber
Gol û cobarên ewêna
Seyraneke bo cot û fer

Gola Ûrmiyê bişên e
Xuya welat tev ji wê
Tîrêjên roja berava
Reng dide delavê wê

Kûpekî wek Agirî
Di nav golê de gir piçûk
Meqseda sed geştiyaran
Nayê berbûyên bibûk

Ey welat çendî tu xoş e
Dehl û zinarên bejî
Gelyê `Elî Beg û Şeranşe
Hem Ehmed  Awayê te jî

**(Yûnis Bahram)**

## Wateyên Peyvan

| Peyv | Wate |
|---|---|
| **Gebar** | Çiyayê Gabarê |
| **Kovî** | Bejî |
| **Şax** | Beşekî çiya ye. |
| **Cobar** | Çemê biçûk |
| **Şên** | Niştecih |
| **Berav** | Qiraxa çem |
| **Kûpek** | Lûtke |
| **`Elî Beg** | Navê sûlaveke li başûrê Kurdistanê ye. |
| **Ehmed Awa** | Navê sûlaveke li başûrê Silêmaniyê ye. |
| **Şeranşe** | Gund û havîngeheke li bajarê Duhokê ye. |

## Guftûgoya Waneyê

1. Malika li jêr şîrove bike:
   **Bê welat nabe**
   **Tu carî xweş jiyan**
2. Malika duyem kîjan wateyên li jêr raber dike:
   a. Her dem kesk e û cihê ger û seyranê ye.
   b. Xwedî av û çiya ne û seyrangeheke xweş e.
   c. Mirov bi rengekî tekane û komî serdana xweşiyên wan dike.
   d. Her sê wate rast in.
3. Li gorî helbestvan, xwêya welat ji kîjan golê der tê?
4. Li gor helbestvan mirov mîna çi seyrana Gola Ûrmiyê dikin?
5. Di malika dawî de, ew navên ku derbas dibin, navên hin cihan in, her cihekî ji wan bi hevokekê bide nasîn.

## Hîndarî

1. Em peyvên li jêr di nava hevokan de, bi kar bînin:
   - Cot……………………………………
   - Fer……………………………………
   - Kovî…………………………………..
   - Bejî…………………………………...
2. Em navên cihên geştyarî û parçeyê Kurdistanê yê wî dihundirîne, bigihînin hev:

| | |
|---|---|
| • Pira Bafilê | Rojhilatê Kurdistanê |
| • Gola Wanê | Rojavayê Kurdistanê |
| • Gola Ûrmiyê | Bakurê Kurdistanê |
| • Şeqlawa | Başûrê Kurdistanê |

3. Em sojeya vê helbestê bi rengekî pexşanî binivîsin:

……………………………………………………………......................

## Efsan

Ew nivîseke wêjeyî ye; tê de hem aşop û hem rastî bi rengekî tevlihev rêsayî ne. Mijarên efsaneyê curbicur in mîna çîrokên xwedawendan û afrirandinê, afrîdeyên xwedî taybetiyên awarte û hwd, tê de hene.

Mînak: Şahmaran, Cûdiyê Mirandan, Kawayê Hesinkar …

### Cûdiyê Miradan

Tê gotin ku di demekê de, li cîhanê bi tevahî tofanek rabû. Vê tofanê ji gundê Daderê dest pê kir. Dema ku ji tenûrekê aveke reş derdikeve û ji rewşa lehî û robaran derbas dibe. Di her derê erdê re, av diavêje, ji ezmanan jî bi heman awayî av tê xwarê.


Tevahî darûber û çiya di bin avê de, dimînin û tiştên heyî wêran dibin.

Lê beriya ku tofan rabe kesekî bi navê Nûh ku pêxember e, amadekariyên xwe kirine. Ji bo xwe û kesên ku bawerî pê dianîn keştiyek çêkiriye. Kesên bawerî pê dianîn û ji hemû cureyên lawiran yek nêr, yek jî mê li keştiya xwe siwar kirine. Ev keştî bi rojan li ser avê geriyaye. Ji ber sedema tofanê, her giyandarek di bejahiyê de dijiya binav bû. Dema tofan radiweste, av kêm dibe, serê gelek çiyayan tê dîtin. Keştî nêzîkî gelek çiyayan dibe, lê wan baweriya xwe pê neanî.

Hinek dibêjin, ev navên efsanewî yên çiyayên; Bêxêr, Nizmû, Zêrînker, Herekol û Cûdî di wê demê de, hatine lêkirin. Dema dixwaze biçe li ser Çiyayê Bêxêr, av rê nade û ew jî xwe baş diyar nake. Jê re dibêje: “Tu bêxêr î” û ji wê demê ve navê wî dibe Bêxêr. Dixwaze biçe ser Nizmû, lê Nizmû xwe nizim

dike. Ji wî re jî dibêje hey Nizmû. Dixwaze biçe ser Zêrînker, Zêrînker xwe bilind diyar dike, lê gelek asê ye.
Ji wî re dibêje bi Yezdan tu Çiyayekî zêrîn î, lê cih û warê min li ser te nîne. Ji wê rojê û pê de, navê wî jî bûye Zêrînker. Di encamê de, tê li ser Çiyayê Cûdî radiweste û kesên tê de, peya dibin. Gundê bi navê Heştanê ava dikin û jiyaneke nû dest pê dikin. Ji wê rojê û pê de, dibe ziyaretgeha gelan.


# 3 ROJHILATÊ KURDISTANÊ



## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. **Gava navê başûr, bakur, rojhilat û rojavayê tê gotin, çi tê bîra mirov?**
2. **Gelo xizmên te li parçeyekî ji parçeyên Kurdistanê yên dîtir hene?**
3. **Di derbarê Rojhilatê Kurdistanê de, tu agahiyên te hene?**

# ROJHILATÊ KURDISTANÊ



Rojhiltê Kurdistanê weke ji navê wê xuya ye, parçeyê Kurdistanê yê ku li rojhilatê welat cih digre. Dema ku roj hiltê parçeyê ku despêkê tîrêjên wê hembêz dike, Rojhilat e. Piştî parçekirina Kurdistanê, rojhilatê Kurdistanê bi ser dewleta sefewî (îranî) ve hat berdan. Vê parçekirinê destê rojhilatê Kurdistanê ji parçeyên welat ên din qut kir.

Erdnîgariya rojhilatê Kurdistanê baş mezin e; rûbera wê nêzî 175. 000 $km^2$ e. Li rojhilatê Kurdistanê parêzgehên mîna Mahabad, Sine, Ûrmiye û Kirmanşahê jî hene. Heger mirov sawir bike ku ew di balafirekê de ye û li herêma Rojhilat ji jor ve baş temaşe bike, wê çiyayên bilind û daristanên bitov bibîne.

Rojhilat jî mîna parçeyên Kurdistanê yên dîtir, bi xwezaya xwe cihêwaz e; bi çiya, zozan, deşt, gol û rûbarên xwe navdar e. Mînak: Li Rojhilatê Kurdistanê Çiyayên Serdeşt, Reş, Mûkriyan, zozanên Kevirê Spî, Beytelan, Hecî Begê û deştên Urmiye, Mêrgewer û hwd hene. Hejmara şêniyên wê nêzî 10 mîlyon kesî ye. Mînak li herêma Xuresanê nêzî 1,5 milyon kesî dijî.

Her weha ji hêla ziman ve jî zimanê kurdî li rojhilatê Kurdistan serwer e; li hin herêman zaravayê soranî, li hin herêman zaravayê kurmancî û li hin herêman zaravayê lorî tê bikaranîn. Tevî ku dewleta Îranê di perwerdehiya fermî de, rê nade ku zimanê kurdî bê dayîn, zimanê kurdî bi zaravayên xwe, xwe parastiye û hewla lipêşxistinê heye. Ji hêla wêjeyê ve jî li rojhilatê Kurdistanê gelek wêjevanan rajeyeke baş ji milet û wêjeya kurdî re kiriye. Nemaze wêjevanên jin mîna Reyhan Xanim, Celale Xanima Loristanî, Xatu Mey Zerd.

## Guftûgoya Waneyê

1. Parçeyê Kurdistanê yê ku destpêkê tîrêjên rojê hemêz dike, kîjan e?
2. Piştî parçekirina Kurdistanê, Rojhilat ket bin dagirkeriya kîjan dewletê?
3. Rûbera rojhilatê Kurdistanê çiqas e?
4. Hejmara niştecihên rojhilatê Kurdistanê çiqas e?
5. Navên hin parêzgehên rojhilatê Kurdistanê, binivîse.
6. Zaravayên ku li rojhilatê Kurdistanê tên bikaranîn çi ne?

## Hîndarî

**1.** Em bajar û parçeyê ku wan dihundirîne bighînin hev:

| | |
|---|---|
| Tirpespiyê | Başûrê Kurdistanê |
| Mêrdîn | Rojhilatê Kurdistanê |
| Sine | Rojavayê Kurdistanê |
| Silêmaniyê | Bakurê Kurdistanê |

**2.** Em du hevokên ku wateya hevoka li jêr raber dikin, binivîsin:

Dema ku roj hiltê parçeyê ku despêkê tîrêjên wê hembêz dike, Rojhilat e.

- ……………………………......………………………………
- ……………………………………………………………………

**3.** Em dijwateyên peyvên li jêr di hevokan de, bi kar bînin:

- Niviya: ……………………………………….………..
- Razan: …………………………………………………

## Rêziman

# Hevok

### Lasakirin û Serbûrî

Bi rêya lasakirina korane, mirov gelek taybetiyên xwe yên baş, ji dest dide. Gelek caran ev lasakirin dibe sedema gelek pirsgirêkan. Li hêla din divê mirov bigihê wê encamê ku di hin cihan de, dikare sûdê ji serbûriyên mirovan bigire. Ev yek nabe lasakirina korane, berovajî wê, ev yeke dikeve bin banê sûdwergirtina ji serbûriyan.

1. Ev gotar ji çend hevokan pêk hatiye; her hevokekê di lênûsa xwe de, cuda binivîse:
   ..........................................................................................
   ..........................................................................................
   ..........................................................................................
2. Gelo wateyên hemû hevokan mîna hev in an na?
3. Her hevokek di hundirê xwe de, ji çi pêk tê?
4. Em ji peyvên li jêr hevokeke biwate saz bikin:
   (bi efsane, min, û Şahmaran, xwendin, Cûdiyê Miradan, şev)
   ..........................................................................................
   ..........................................................................................
   ..........................................................................................

**Pênaseya hevokê:** Ew çend bêje ne ku li gorî rêbazeke rêzimanî li pey hev tên rêzkirin, wate, hest, dîtin û ramanekê ji me re radigihînin.

**5.** Em ji peyvên li jêr hevokan saz bikin û di pey re weke mijar bihûnin:

(bin, em, bikin, ku, sînor ,tune, aşop)

..........................................................................................

..........................................................................................

(bijîn, gel. bi, hev, bê, hemû, sitemkarî, re)

..........................................................................................

..........................................................................................

(sitemkarî, rabin, kuştin , ji, holê, û)

..........................................................................................

..........................................................................................

(nîşan, li, deveran, azadî, sembol, biba, û, hemû)

..........................................................................................

..........................................................................................

(xweş, jiyan, çiqas, wê, û, geş, ba)

..........................................................................................

..........................................................................................

**Mijar:**

..........................................................................................

..........................................................................................

..........................................................................................

..........................................................................................

..........................................................................................

.

## Derbirîn

Di derbarê cihekî xweş ku te serdana wî kiriye de, mijarekê li gorî xalên li jêr binivîse:

1. Navê cih çi bû?
2. Awayê serdanê çawa bû?
3. Tiştên balkêş di cihê serdanê de, çi bûn?
4. Ev serdan malbatî yan bi hin kesên din re bû?
5. Vê serdanê hestekî çawa li gel te afirand?

# BEŞA ŞEŞEM

## HEZKIRINA WELAT

1 Welat

2 Bi Zanistê Parastina Welat

3 Ey Şehîd

# Armancên Beşê

**Di dawiya vê beşê de, ji xwendekar tê pêşbînîkirin ku bikaribe:**

1. Waneyan bi rengekî dirust û tekûz bixwîne.
2. Girîngiya hezkirina welat û xwedîderketina li wî nas bike.
3. Girîngiya zanistê di avakirina welatan de, nas bike.
4. Helbestê bi rengekî awazî bixwîne, naveroka wê tê bigihêje û çend xêzan jê ezber bike.
5. Wateyên peyvên nû nas bike û wan peyvan di nivîsên xwe de, bi kar bîne.
6. Cureyên hevokan nas bike, wan ji hev cuda bike û di derbarê wan de, mînakan bide.
7. Di hevokê de, fêrî rewş û cihên bikaranîna tîpa mezin, bibe.
8. Şanoyê nas bike û hêmanên wê destnîşan bike.
9. Di derbarê mijara beşê de, bi rengekî wêjeyî û xweş hest, raman û nêrînên xwe weke mijar derbirîne.

# 1 WELAT



## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. Tu herî zêde ji kîjan welatî hez dikî?
2. Navê welatê kurdan çi ye?
3. Tu dixwazî li welatê xwe yan ji derveyî wî bijî û çima?

# WELAT



Dema ku gotina welat tê gotin, jixweber di dilê mirov de hestên cuda çêdibin û yekser navek tê bîra wî, ew jî navê cihê xewn û xeyelên wî, warê bav û kalên wî; navê welatê wî ye.

Mirov dikare welat bi gelek awayan pênase bike, lê tekez dê tîpên hemû alfabeyan nikaribin hezikirin û wateya wî ya di dilê mirovên wî de, raber bikin.

Bi wateyeke giştî, ji xaka ku mirov li ser dijî, warê bav û kalên wî, herêma ku tê de ziman, çand û neteweya xwe werdigere re, welat tê gotin.

Welat ji bo mirovan mîna dayîkê ye; mirov di himbêza wî de hemû wateyên xweşî û aramiyê nas dike. Bê minet ji xêr û bêra wî sûdê werdigre û kêliyên herî bi wate li nava kuçe û sikakên wî derbas dike.

Mirov dikare ji derveyî welatê xwe jî bijî! Lê jiyaneke bi êş

û kovan. Her çiqas mriov ne li ser xaka welatê xwe bijî jî lê tekez welatê wî di dilê wî de dijî. Têkilya welat û xelkên wî têkiliyeke hevgirtî û temamker e; mirov bê welatê xwe kêm dimîne û li şûna neteweya xwe neçarî wergirtina netewe, ziman û çandeke din dibe. Her weha welat jî bê xelkên xwe, rastî talankirin û wêrankirinê tê ...

Jixwe tiştê herî şêrîn û biha li cem mirovan, giyanê wan e, lê di oxira welatê xwe de, mirov wî giyanê buha jî feda dike û hezkirina welat di ser hezkirina giyanê xwe re dibîne.

Heger mirov li dîroka kîjan welatî vegere, dê bibîne ku di rewşên herî zehmet de, xelkên wî bê dudilî li hember hemû metrsiyan kar û xebat ji bo welatê xwe kirine û bi hezaran ji zarokên wan di rêka rizgarkirin û parastina wî de, şehîd ketine.

Hemû omîd û xwestekên me, şopên evîn û hezkirina me û pêşeroja me, girêdayî welatê me ne. Em mîna parçeyekî ji giyanê vî welatî ne; êşa welat êşa me ye û azadî û serfirzaiya wî jî azadiya me bixwe ye.

Her çiqas di encama şer û pişaftinan de, gelek mirov  bê welat mabin jî lê ji her mirovekî re welatek heye ku her dem bi hezkirina wî rû bi rû dimîne.

Ji bo me kurdan jî welatek heye. Welatê ku çiyayên wî mîna pasevanan bê rawestan parastina wî dikin, herêma ku her du çemên Dîjle û Feratê jê re bûne mîna du guliyên hûnandî û wê dixemilînin, warê ku fîxana bilbilan li nav baxên wê, mîna vedenga awaz û rsitên Seydayê Tîrêj û Mihemd Şêxo ye, welatê sirûda “Ey reqîb” ku mîna tîrêjên rojê tarîtiya şevên zordestiyê ji nav dibe, welatê me ye; Kurdistan e.

## Guftûgoya Waneyê

1. Li gorî têgihiştina te ji waneyê re, welat pênase bike.
2. Çima welat mîna dayîkê tê dîtin?
3. Têkiliya welat û xelkên wî bi hev re şîrove bike.
4. Li gorî te çima mirov giyanê xwe yê buha fedayî welatê xwe dike?
5. Li gorî waneyê, çima mirov mîna parçeyekî ji giyanê xwelatê xwe tê dîtin?
6. Li gorî te mirov bê welat rastî zehmetiyan tê yan na? Şîrove bike.

## Hîndarî

1. Em ji waneyê hemwateyên peyvên li jêr destnîşan bikin:
   kolan.......................... xem.......................... hêvî..........................
   parêzvan .......................... dengvedan ..........................
2. Em wateya peyva **"tîr"** di her hevokekê de destnîşan bikin:
   - **Tîra** ku ji kevanê derkeve, careke din venagere.
   - Kêfa min pir ji meyirê re tê, bi taybet meyira **tîr**.
3. Em gotinên li jêr li rex her hevoka ku wê dinimîne, binivîsin:
   (serbilindî- dilsozî - aramî û kêfxweşî- xemgînî)
   - Mirov kêliyên herî bi wate li nava kuçe û sikakên welatê xwe derbas dike. ( )
   - Mirov dikare ji derveyî welatê xwe jî bijî! Lê jiyaneke bi êş û kovan. ( )
   - Mirov di oxira welatê xwe de, giyanê xwe yê buha jî feda dike. ( )
   - Welatê sirûda "Ey Reqîb" ku mîna tîrêjên rojê tarîtiya şevên zordestiyê ji nav dibe, Kurdistan e. ( )

## Rêziman

# Cureyên Hevokan

### Hevokên pirsyarî:

**Ev curehevok bi rêya pirsê agahiyan werdigirin.**

Mînak:

**1.** Em bersivên pirsên li jêr bidin:
- **a.** Gelo mijarên wêjeyî yan ên zanistî, bêhtir bala te dikşînin?
- **b.** Gelo em her du rûyên heyvê yan rûyekî bi tenê dibînin?
- **c.** Her kîlometreyek ji çend metreyan pêk tê?

**2.** Em di damika li jêr de, pirsên bersivan binivîsin:

| Pirs | Bersiv |
|---|---|
| ............................................ | Werziş ji bo tenduristiya mirovan gelekî baş e. |
| ............................................ | Gola Wanê li Bakurê Kurdistanê ye. |
| ............................................ | Avrêja Cemê Nîlê Deryaya Spî ye. |

### Hevokên ragihandinî:

**Ji hevokên ku di derbarê rewş û tevgerekê de, agahî û ramanekê radigihînin re, hevokên ragihandinî tê gotin.**

Mînak:

- Zeredeşt dibêje: “Divê mirov bi rêzgirtin nêzî her tiştî bibe û weke giyanber lê temaşe bike.”
- Li ser rûyê erdê gelek çiyayên volkanî hene û di jêr wan çiyayan de, volkanên vermirî hene.

» Çemê Amazonê ji hêla dirêjbûnê ve, piştî Çemê Nîlê tê.
» Hz. Mihemed dibêje: “Mirov di zimanê xwe de, veşartî ye.”

Têbînî*:* Hevokên bûrî, hevokên ragihandinî ne; agahiyên nû ji me re pêşkêş dikin.

Em di derbarê hunermendê kurd ê navdar “ Mihemed Şêxo” de, sê hevokan weke agahî binivîsin:

**a.** ........................................................................................................
**b.** ........................................................................................................
**c.** ........................................................................................................

**Hevokên Fermanî:**

**Di hevokên fermanî de, fermanek heye ku kirina karekî ji hinan tê xwestin.**

**Dilo rabe dilo rabe**

**Dilo rabe dilo <u>rabe</u>**
**<u>Veke</u> çavan ku êvar e**
**Nezan û bes di xew da be**
**Bi newmê re, <u>mebe</u> yar e**

**(Feqiyê Teyran)**

**1.** Di helbestê de, çend caran ferman hatiye dayîn?
**2.** Gelo gotinên binxêzkirî, nav in an lêker in?
**3.** Wateya vê helbestê bi kurtahî goftûgo bikin.
**4.** Peyvên li jêr di hevokan de bi kar bînin; bila ev hevok, hevokên fermanî bin:

**(avakirin, bişaftin, hilgirtin, razan)**

..........................................................................................................
..........................................................................................................
..........................................................................................................

# 2 BI ZANISTÊ PARASTINA WELAT




## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. Ji bo parastina welatekî çi pêwîst e?
2. Gelo zanist dikare welatan biparêze û çawa?

# BI ZANISTÊ PARASTINA WELAT

Di jiyana mirovan de rastiyeke berçav heye, mirov dikare vê rastiyê di hemû serdeman de jî bibîne, ew jî hezkirina welat e.

Hezkirina welat serweriyê li dilê her mirovekî dike û dibe beşek ji jiyana wî. Bêguman li seranserî dîrokê, gelek welat rastî êrîş, talankirin û dagirkeriyê hatine û di encama gelek berxwedan û serhildanan de, gelek welat jî gihaştine azadiya xwe.

Beşek mirov jî li şûna ku ji welatê xwe re bibin stûn û di tengasiyan de wî rizgar bikin, ew dikevin rêyên şaş û ziyanê dighînin welatê xwe. Ew ji bo berjewndiyên xwe yên kesayetî welatê xwe berdidin û bi sozên derewîn têne xapandin.

Ji bo ku mirov li welatê xwe xwedî derkeve û wî biparêze, gelek rê û rêbaz hene. Ev rê û rêbaz, mîna rêzexelekên gerdeniyekê hev du temam dikin; windabûna xelekekê ji wan dê valahiyekê bihêle. Ji bo mirov ji welatê xwe bêpar nemîne, pêwîst e di her kêliyên şîn û şahiya wî de li rex wî be.

Ji bo parastina welatekî qehrmanî û mêranî tiştin bingehîn in, lê têkoşîna leşkerî tenê têrê nakê, li rex wê pêwîstî bi zanist, zanebûn, perwerde û xwendinê heye, her weke **Edward Evereett (mamoste û gotarbêjekî amerîkî ye) dibêje: “Perwerde ji artêşeke birêkûpêk baştir, welatan diparêze.”**

Jixwe sedemên gelek xirabiyan nezanî ye. Heger mirov zana be û zanista xwe di rêyeke rast de bi kar bîne, ev yek dê di qada tenduristî, aborî, leşkerî, siyasî û hwd de, bandorên erênî li welatê xwe bike.

Mînak: Di welatekî pêşketî de ku pûtedan û girîngiyê dide zanistê, dê rêjeya nexweşî, şer, koçberî ... tê de kêm be. Her weha dagirkirina wî welatî jî wê zehmet be û ew ê her dem ji pêşketinê re vekirî be.

Xala bingehîn ku welatan têk dibe, nezanî û kêmbûna xwendinê ye. Ji bo vê yekê jî dema ku welatek dikeve bin nîrê dagikeriyê, gava yekem ku dagirker pê radibe pûçkirina perwerdeyê ye. Berovajî wê jî dema welatek dixwaze rizgar bibe û bi pêş bikeve, perwerdeyê dide pêş. Mînakên vê yekê jî gelek in, yek ji wan jî welatê Japonyayê ye.

Di şerê cîhanê yê duyem de, Japonya ji aliyê Amerîkayê ve rastî êrîşeke kîmyayî hat û di encamê de, bi hezaran mirov hatin kuştin û birîndarkirin û wêraniyeke mezin di xweza û binçîneya wî welatî de, çêbû. Lê Japonyayê bi saya zanist, perwerde û xwendinê di demeke nedirêj de, xwe ji vê rewşê rizgar kir. Di roja îro de, Japonya di gelek waran de ji Amerîkayê pêşketîtir e. Her weha di aliyê perwerdeyê de jî Japoniya pir li pêş ket û îro gelek welat di nava wan de Amerîka jî sûdê ji tecrubeya wê digirin.

Lê xaleke sereke ku divê neyê jibîrkirin, ew e ku zanist di rêyeke rast de bê bikaranîn û nekeve bin banê desthlatdariyê, ango zanisteke ji bo civakê be û di nava xwe de hemû nirxên civakî bihundirîne. Her weha nebe sedema talankirin û dagirkirina welat û neteweyên din; ango nabe di bin navê azadiya welatê xwe de, ez zordestiyê li welatên din bikim.

## Guftûgoya Waneyê

1. Mijara waneyê derbarê çi de ye?
2. Kesên ku ji bo berjewendiyên xwe yên kesayetî dest ji welatê xwe berdidin, bandoreke çawa li welatê xwe dikin?
3. Ji bo parastina welatekî çi pêwîst e?
4. Girîngiya zanistê di avakirin û parastina welatan de, diyar bike.
5. Japonya di encama şer de, rastî wêraniyeke mezin hat û ket rewşeke aloz, lê îro ew yek ji welatên herî pêşketî ye. Vê yekê binirxîne.
6. Tu weke xwendekar çawa dikarî li welatê xwe xwedî derkevî?

## Hîndarî

1. Em hemwateya rast a peyvên li jêr hilbijêrin:
   - Gerdenî: (dilxwazî – ristik – gotin)
   - Nîr: (zordestî – alîkarî – serxwebûn)
   - Binçîne: (binax – binyat – bindest)
2. Em wateya peyva **"per"** di her hevokekê de, destnîşan bikin:
   - Qulingê ku **perên** wî şikestî bin, her dem li dû refê xwe dimîne. (          )
   - Qada pîrozkirina Cejna Newrozê li **perê** gundê me ye. (          )
3. Em van gotinan **(aşopî – rastî – nêrîn)** li rex hevoka ku wê dinimîne, binivîsin:
   - Qamişlo xweştirîn bajarê Kurdistanê ye. (          )
   - Navê welat li ser dilê mirovan hatiye kolan; ew dil her dem ji bo wî lêdide. (          )
   - Welat bi zanist, perwerde, xwendin û têkoşînê li pêş dikevin. (          )

## Rêziman

### Tîpa Mezin

- Elî Herîrî û Baba Tahirê Uryan, ji helbestvanên herî kevn in.
- Ji wêjevanên kurd Mestûra Kurdistanî (Erdelanî) xwedî cihekî berz e.
- Melayê Cizîrî bi nasnavê Nîşan jî navdar bû.
- Yûnis Reûf wêjevanê navdar, bi nasnavê Dildar dihat nasîn.
- Sine û Mahabad du bajarên Rojhilatê Kurdistanê ne.

**1.** Di van hevokan de, gotinên ku bi tîpa mezin dest pê kirine, destnîşan bike.

**2.** Gelo çima tîpa yekem ji van navan, mezin hatiye nivîsîn?

**3.** Li gorî têgihiştina xwe rêgezan temam bike:

**a.** Navê mirov, tîpa despêkê jê, mezin tê nivîsîn.

**b.** Paşnavê mirov, tîpa ……………………….............................

**c.** Nasnavê mirov, ……………………………………........................

**d.** Navê bajaran, ......................................................................

**4.** Em valahiyan bi gotinên li jêr dagirin:

**Apo, Mîr Mihemed, Herekol Ezîziyan**

- Celadet Bedirxan bi nasnavê ………………..... jî dihat nasîn.
- ………………….. bi Feqiyê Gerok jî dihat nasîn.
- Osman Sebrî bi nasnavê …………… navdar bû.

**5.** Em guhertinên guncaw di hevokên li jêr de, pêk bînin:

» Navê wî sîpan e, lê nasnavê wî, mêrxas e.

.......................................................................................................

.......................................................................................................

» Navê bajarê min kirmanşah e.

.......................................................................................................

.......................................................................................................

» Navê seydayê cegerxwîn ê rasteqîn şêxmûs bû.

.......................................................................................................

.......................................................................................................

# 3 EY ŞEHÎD



## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. **Kesê ku canê xwe ji bo welatê xwe feda dike, em çi navî lê dikin?**
2. **Gelo şehadet tunebûya, dê welat rizgar bûbana?**

# EY ŞEHÎD

Canfidayê gel, şehîdê welat
Em dikin pîroz, cejna te b` şewat

Ku te bi merdî, emrê xwey ciwan
Di riya millet, te daye qurban

Ne em tenê, lê cîhan seraser
Cajna te dikin, li her cih û der

Em ji nêv baxa, gula dicivînin
Li ser gora te, xweş direşînin

Li ser kêla te, şehîdê dilêr
Em dihêvêsin, bi ava zîv û zêr

Em didin zanîn, kar û barê te
Em nîşan didin, cih û warê te

Gora te weke, baxê bihiştê
Heval û hogir, tev tên teniştê

Dê û bavê te, bira û pismam
Ap û xalê te, ew xuşk û dotmam

Li dor gora te, dibin wek xelek
Hêstran dirêjin, ji çavên belek

Tu canfidayê, kar û xebat î
Hem tu kuştiyê, jîna welat î

Her dem di dil û di hinavê me
Tim sawêra te, li ber çavê me

Tu comerdtir î, ji me yeka yek
Bi çoganê te, goga me çê şeg

**(Seydayê Tîrêj)**

## Wateyên Peyvan

| Peyv | Wate |
|---|---|
| **Direşînin** | Belav dikin |
| **Kêl** | Kevirên ku li her du aliyên goran tên danîn. |
| **Dilêr** | Wêrek |
| **Dihêvêsin** | Dinivîsin |
| **Çogan** | Şiv |
| **Şeg** | Di helbestê de, bi wateya armancê hatiye, ango cihê ku pêwîst e gog bighêjê. |

## Guftûgoya Waneyê

1. Mijara helbestê di derbarê çi de ye?
2. Li gorî helbestê, helbestvan ji bo qehremaniya şehîd, çi kiriye?
3. Helbestvan gora şehîd weke baxê buhiştê nîşan daye. Gelo mebesta wî çi ye? Şîrove bike.
4. Bi alîkariya mamosteyê xwe her du xêzên dawî ji helbestê, şîrove bike.
5. Li gorî têgihiştina te ji helbestê re, çar taybetiyên şehîd desnîşan bike.
6. Li gorî te, divê tu çawa nêzî şehîdan bibî û çawa li keda wan xwedî derkevî?
7. Bi çend xêzan hezkirina xwe ji şehîdan re, diyar bike.

## Hîndarî

1. Em peyva ku naveroka hevoka li jêr raber nake, destnîşan bikin:
   - Canfidayê gel, şehîdê welat
     Em dikin pîroz, cejna te b` şewat
     (qehremanî - xemgînî - tirs)
   - Ne em tenê, lê cîhan seraser
     Cajna te dikin, li her cih û der
     (hezkirin - xapandin - dilsozî)
2. Em ji helbestê malika ku wateya hevoka li jêr raber dike, destnîşan bikin:
   Em li ser rêya te dimeşin û doz, armanc, welat û dîroka te didin nasîn.
3. Em wateya peyva **xal** di her hevokekê de, binivîsin:
   - Wexta şer **xal** û xwarzî, wexta kevçî ap û birazî. (      )
   - **Xala** li ser rûyê wê, gelekî xweşik û balkêş e. (      )
   - Li gorî rêzimana me li dawiya hevoka sergîhayî, **xal** tê nivîsîn. (      )

## Agahiyên Wêjeyî

### Şano

Şano: Hunereke pir kevn e, tê de, tevgera lîstikvanan, gotûbêj û cihê pêşkêşkirinê, bingeh in.

Hunereke wêjeyî ye, çîrokeke destnîşankirî vedibêje, li ser çend dîmenan dabeş dibe, li ser danûstandina navbera lîstikvanan ava dibe, li pêşberî cemawerkî di çarçoveyeke hunerî de, tê pêşkêşkirin.

**Ji hêmanên wê:**

- Ramana sereke
- Kesayet
- Gotûbêj

## Derbirîn

Ji ber ku hezkirina welat daye ser dilê her mirovî, girîngî û hezkirina welat di çîrok, stran û helbestên hemû neteweyan de, bûne babet û mijarên bingehîn.

Bi çend xêzan dabaşa welatê xwe bike. Di nivîsa mijarê de, hewl bide ku tu van xalên li jêr di ber çavan re derbas bikî:

1. Girîngiya girêdana bi axa welat ve.
2. Girîngiya zanistê di parastina welatan de.
3. Rola şehîdan di rizgarkirina welatan de.

Hewl bide ku tu mijara xwe bi biwêj û gotinên pêşiyan dewlemend bikî.

# BEŞA HEFTEM

## LÎSTIK

1 Lîstikên Werzişî

2 Şetrenc

3 Werziş

# Armancên Beşê

**Di dawiya vê beşê de, ji xwendekar tê pêşbînîkirin ku bikaribe:**

1. Waneyan bi rengekî dirust û tekûz bixwîne.
2. Nêrîneke baş di derbarê werziş û cureyên wê de, bistîne.
3. Şetrencê bi rengekî baş nas bike û hewl bide ku fêrî lîstina wê bibe.
4. Sirûdê baş bixwîne û çend malikan jê ezber bike.
5. Wateyên peyvên nû nas bike û wan peyvan di nivîsên xwe de, bi kar bîne.
6. Rewş û cihên ku xal û bêhnok tê de tên bikaranîn, bi bîr bîne.
7. Bîranînê, nas bike û wê ji cureyên nivîsên wêjeyî yên din cuda bike.
8. Di derbarê mijara beşê de, bi rengekî wêjeyî û xweş hest, raman û nêrînên xwe weke mijar, derbirîne.


# 1 LÎSTIKÊN WERZIŞÎ




## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. Di jiyana xwe de tu qet bi çalakiyên werzişî radibî?
2. Zêdertir werzişa ku mejî rahênan dike yan werzişa ku laş xurt dike, bala te dikişîne?
3. Gelo tu hin sûdên lîstika goga pêyan yan jî lîstika daman dizanî?

# LÎSTIKÊN WERZIŞÎ




Mirov di encama serboriyên xwe de, ji gelek tiştan sûd girtiye û gelek tişt ji bo xwe bi kar anîne. Lîstik û werziş jî yek ji van tiştan e ku mirovan di encama serboriyên xwe de, ew li pêş xistine. Heger mirov bala xwe bide derdorê, dê bibîne ku hem lawir hem jî mirov di piçûkaniya xwe de bi liv û tevgerên taybet radibin û dilîzin.

Ji piçûkanî ve bi rengekî xwezayî lîstin li cem mirov peyda dibe û ew lîstin bi rengekî erênî bandorê li laş û derûniyê dike, lê cudahiya mirovan ji zindiyên din ew e ku mirov ev lîstik li pêş xistine û rêkûpêkiyek daye wan.

Ji demên kevin ve û ji ber girîngiya wê ya zêde, mirovan pûtedanek mezin daye lîstikên werzişî û ew bi gelek awayan li pêş xistine û ji bo baştir kar bê kirin, yarîgeh û zagonên taybet bo lîstikê danîne.

Li gelek welatan pêşbirk û matşên werizî pêk tên. Ev pêşbirk dengvedaneke mezin li cîhana me çêdikin. Lîstikvan an jî tîma serkeftî ji bilî sûdên ku li kesayeta xwe dike, ew muhra xwe li dîrokê dixe û dikeve arşîfa kesên ku nayên jibîrkirin. Her weha dikare nav û dengê welatê xwe bigihîne her derê û hezkirina werzişê di nava nifşên piştî xwe de, biçîne.

Mirov dikar lîstikên werzişî li ser du curyan dabeş bike. Cureyek girêdayî laş û derûniyê ye ku bikaranîna wê laş xurt û bi hêz dike û nexweşiyên derûnî ji mirovan dûr dixe. Her weha pergala parastin û gera xwînê di laş de xurt dike û heta astekê rê li ber nexweşiya şekir jî digire. Li gorî hin lêkolînan, meşa bilez rêjeya çêbûna nexwşiyên derûnî 26% kêm dike. Hin lîstikên girêdayî vî cureyî ev in: goga pêyan, goga zembîlê ... cureya din girêdayî rahênankirina mejî ye ku di rêya bikaranîna wê de, mejî tev dide û dixebite mîna şetrenc, dam ...

Jixwe zargotina kurdî jî bi mamik û zûgotinokên ku ew jî weke beşekî ji vî cureyî tê dîtin, dewlemend e. Kurdan girîngiyeke mezin daye vî cureyî û di şevbuhêrik û civatên xwe de, her dem ew bi kar anîne. Ev zûgotinok ji bilî ku hêza têgihiştina mejî xurt dikin jî ew bi kesên ku pirsgirêkên wan ên bilêvkirina hin dengan hene re, dibin alîkar; ango ziman jî rahênan dikin.

Ev her du cure li ser asta cîhanî pir li pêş ketine, êdî lîstikvan jî mîna wêjevan û hunermendan bûye xwedî bandor. Li tevahiya cîhanê gelek mirovên ku di qada werzişê de serkeftî bûn, nav û dengê wan pir belav bûye. Mîna lîstikvanê goga pêyan ê berzalî Ronaldo. Her weha lîstkvanê nerwicî Maginos Karilsin ku weke baştirîn lîstikvanê şetrencê, tê naskirin.

Jixwe ji her cureyekî werizşê re pîvan û rêgezên taybet hene, ku li gorî wan ev lîstik tên lîstin.

Yek ji çalakiyên werzişî yên navdar kasa (cam) cîhanê ya goga pêyan e ku her ji çar salan carekê ev çalakî li welatekî pêk tê û tê de matşên

goga pêyan dest pê dikin û tîmên piraniya welatan tê de, beşdar dibin û di dawiyê de, tîma serkeftî tê xelatkirin.

Ev curewerziş li ser asta kesayetê bi taybet û li ser asta civakê bi giştî roleke erênî dilîze. Ji bo vê yekê jî divê handana wan kesên ku ji werzişê hez dikin bê kirin. Her weha alav û amûrên taybet bi van lîstkan peyda bibin û xulên fêrkirinê û pêşbirk bên lidarxistin.

## Guftûgoya Waneyê

1. Çima mirovan girîngiyeke mezin daye lîskê?
2. Lîstikvanê serkeftî çawa dikare sûdekê bide civakê?
3. Li gorî waneyê werziş li ser çend cureyan tê dabeşkirin?
4. Sûdên werzişê bo laş bihejmêre.
5. Navên çend lîstikên hizrî binivîse.
6. Çi sûdên zûgotinok û mamikan hene?
7. Dabaşa lîstikvanekî ku bala te dikêşe, bike û rol û sûdên wî li derdorê, aşkere bike.

## Hîndarî

**1.** Em hemwateya peyvên li jêr destnîşan bikin û wan di nava hevokan de, bi kar bînin:

Zargotin: (folklor - pirtûkxane - zanîngeh)

..........................................................

Handan: (tirsandin - têkbirin - gurkirin)

..........................................................

Serborî: (serhişkî - serpêhatî - afirandin)

.........................................................

**2.** Em wateya peyva **"kur"** di her hevokekê de, destnîşan bikin:

- **Kurê** birayê min di lîstika şetrencê de, serkeftî ye.
- Miha me ya **kur** bişîr e.
- Memo riya xwe **kur** kir, simbêlê xwe bada û berê xwe da şahiyê.

**3.** Zûgotinok û mamikên kurdî weke beşekê ji werzişa girêdayî mejî, tên dîtin. Hewl bide tu çend mamik û zûgotinokan, berhev bikî û bi heval û mamosteyê xwe re, parve bikî.

**Mînak:**

Keka ka ka ga
Te ka da ga

## Xalbendî

### Dana Mele

Dibêjin ku carekê mirovekî gundî ji melayekî re got: “Seydayê min, çima hûn mela her dem ji xelkê re dibêjin ka û ka? Hema carekê bêjin ha ji we re jî.!”

Hema mela di dewsa xwe de û bi xar dest avête  bêrîka xwe û qutiya xwe ya tûtinê derxist û ji mirovê gundî re got:" Ê de ji we re qutiya min û ji min re tijî tûtin bikin."

**1.** Di vê nivîsê de, çend caran xal (.) derbas bûye?
**2.** Cihê ku xal lê hebe, divê mirov raweste an bêhnê vede?
**3.** Gelo li pişt xalê, tîp çawa tê nivîsîn?
**4.** Ji bilî xalê çi xalbendiyên din hatine bi kar anîn?

**Rêgez**

**Xal:** Di nivîsê de, xal cihê rawestînê nîşan dide; gava çavên mirov pê dikevin, divê raweste.

**Rewşên ku xal tê de, tên bikaranîn:**

Piştî ku hevok bi dawî dibe, xal tê bikaranîn.

**Mînak:**

Ji bo bicihkirina xalê, bi alîkariya mamoste mînakan bidin:

…………………………………………………………………………

…………………………………………………………………………

…………………………………………………………………………

Piştî navên ku hatine kurtkirin, xal tê bicihkirin:

Mînak:

- Dr. Ehmed Nafiz, di warê bizîşkiyê de, raje ji miletê Sûriyeyê bi tevahî re kir.
- Ji wêjevanên kurd ên ku di warê wêjeyê de, xebitîne prof. Qenatê Kurdo ye.
- E. Xanî, girîngî dida perwerdeyê û weke rêya felatê didît.

Em parçeyên destpêkê yên navên li jêr kurt bikin û wan navan di hevokan de, bi kar bînin:

Melayê Cizîrî .........................................................................

Duktor Ebdulrehman Qasimlo ………………………………...…....

Duktor Kamîran  Bedirxan ……………………………..........................

Di nivîsa dîrokê de, di navbera roj, meh û salê de, xal tê bicihkirin:

Mînak:

1. Di 22.1.1946`an de, Komara Kurdistanê hate ragihandin.
2. Li Qamişloyê di 12.3.2004`an de, gel li hember stemê serî hilda.

**Em dîroka jidayîkbûna xwe (roj, meh û salê) binivîsin:**

....................................................................................................

....................................................................................................

# 2 ŞETRENC



## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. Tu di derbarê şetrencê de, çi dinasî?
2. Di mal, dibistan û taxa we de, kesên ku mijûlî şetrencê dibin, hene?
3. Tu dixwazî fêrî vê lîstikê bibî yan na û çima?

# ŞETRENC



Yek ji navdartirîn lîstikên hizrî ku li ser asta cîhanî tê nasîn, şetrenc e.

Şetrenc, lîstikeke ku xwe dispêre mejî û baldariyê û tê de heycaneke zêde peyda dibe. Piraniya lîstikvanên wê, bi zîrekbûna xwe tên nasîn. Pêwîstiya vê lîstikê bi baldarî û hişyarbûneke zêde heye. Ev lîstik bi demê re hêza mejî û têgihaştinê li gel mirovan zêde  dike.

Şetrenc çawa tê lîstin? Ew di navbera du kesan de, li ser parçeyeke text ku li gorî hin pîvanan hatiye çêkirin, tê lîstin. Ew ji şêst û çar damikan pêk tê û ji her lîstikvanekî re şazdeh (kevirên lîskê) hene; ango bi giştî sî û du kevir in. Ew xwedî rol û erkên taybet in û tevger û bizava wan diyar e; ew li gorî pîvanên lîskê, di çarçoveyên taybet de tev digerin. Ew jî ev in (ji her lîstikavanekî re): heşt leşker (peyak), du fîl, du hesp, du keleh, yek wezîr (ferzîn) û yek şah. Lîstik bi têkbirina şah bi dawî dibe. Ji bilî van jî gelek pîvanên vê lîstikê hene. Her weha planên taybet ji bo bidestxistina serkeftinê hene.

Ev lîstik ji demeke kevn ve, hatiye afirandin; dîroka wê vedigere nêzî 1500 salî. Tê gotin ku ew cara yekem li Hindistanê hatiye afirandin û piştre derbasî cem faris, çînî û japoniyan bûye û li tevahiya cîhanê belav bûye. Kurdan jî xwe ji vê lîskê bê par nehiştiye û ji demên kevn heta roja îro, ev lîstik di nava kurdan de tê lîstin. Ev yek di Dastana Mem û Zînê de, berbiçav e. Tê de mîrê Cizîra Botanê, Mîr Zeyneldîn lîstina şetrencê bi Memê re weke mercekî dide pêş û dibêje ku kesê bi ser bikeve, dê daxwaza kesê din pêk bîne.

Lîstika şetrencê dengvedaneke mezin li tevahî cîhanê çêkiriye û gelek pirtûk di derbarê awayê lîskê, planên ji bo serkeftinê û pêkanîna rêgezên wê de, hatine çêkirin. Her weha hin welatan ev lîstik weke biranş derbasî dibistanên xwe kiriye û bi rengekî fermî û bi rêk û pêk zarokan fêrî vê lîstikê dikin. Mîna welatê Ermenistanê ku di sala 2011`an de, biranşê şetrencê li dibistanên xwe derbasî qonaxa seretayî kiriye.

Ji bilî wê jî gelek sazî û desteyên girêdayî vê lîstikê, hatine damezrandin. Mîna Yekîtiya Navdewletî ya Şetrencê (FIDE) ku di 20`ê tîrmeha sala 1924`an de, li Firansayê di bin slogana "Em hemû miletek in" de, hat damezrandin.

Ew rêxistineke cîhanî ye, çalakiyên lîstikên şetrencê ku li tevahî cîhanê çêdibin, bi rêxistin dike û rêgez û pîvanan destnîşan dike. Her weha pileya kesên serkeftî li gorî asta wan destnîşan dike û xelat û diyariyan pêşkêşî wan dike.

Lîstikvanên şetrencê beşeke mezin ji civakê pêk tînin; li tevahî cîhanê nêzî 605 milyon kes bi rengekî fermî bi şertrencê dilîzin.

Li Hindistanê herî kêm salê carekê ji aliyê 70% ji gelê wê ve, ev lîstik tê lîstin û li Rûsyayê bi rêjeya 43% tê lîstin.

**Hin lehengên cîhanî yên şetrencê:**

**Magnus Carlsen (Magnos Karilsin):** Lehengekî şetrencê yê nerwicî ye. Wî ji pênc saliya xwe ve dest bi lîstkê kiriye. Ew di gelek lehengi-

yan de beşdar bûye û gelek serkeftin bi dest xistine.

**Garry Kasparov (Garî Kasparov):** Lehengekî şetrencê yê rûs e. Ew weke mamosteyê şetrencê dihat nasîn. Wî yazdeh xelatên Oskarê bi dest xistine.

**Levon Aronian (Lîvon Aronyan):** Lîstikvanekî ermen e. Li gorî dabeşkirina Yekîtiya Navdewletî ya Şetrencê, di sala 2014`an de, Lîvon asta duyem bi dest xistiye. Her weha sala 2015`an kasa (cam) cîhanî ya şetrencê bi dest xistiye.

## Wateyên Peyvan

| Peyv | Wate |
|---|---|
| **Biranş** | Navê zanista ku li dibistanan tê dayîn. |
| **Deste** | Komîte |
| **Oskar** | Xelateke cîhanî ye ji bo kesên serkeftî tê dayîn. |

## Guftûgoya Waneyê

1. Şetrenc çi ye? Bi kurtasî dabaşa wê bike.
2. Çend kevirên lîstika şetrencê hene? Navên wan diyar bike.
3. Cara yekem şetrenc li ku derketiye û dîroka wê vedigere kengî?
4. Şetrenc li kîjan welatî weke biranş tê dayîn? Di nêrîna te de gelo ev yek baş e yan na, binrxîne.
5. FIDE çi ye?
6. Garry Kasparov çend xelatên Oskarê bi dest xistine?
7. Di nêrîna te de lîstika şetrencê baş e yan na û çima?

## Hîndarî

1. Ji peyvên li jêr hemwateya peyvên sorkirî, destnîşan bike:
   - Bizav: (tevger – xemil – karîn)
   - Slogan: (teşe – bend – dirûşm)
2. Ji hevokên li jêr, hevoka ku ji aliyê wateyê ve dûrî vê hevokê ye **“Em hemû miletek in”** destnîşan bike:
   - Em hemû weke xwişk û biran in û mafê me hemûyan weke hev e.
   - Ziman, çand, hizir û nêrînên me hemûyan yek in.
   - Em ji hev hez dikin û girêdana me bi hev re heye.
3. Em van gotinan (aşopî – rastî – nêrîn) li rex hevoka ku wê dinimîne, binivîsin:
   - Magons Karlisin, lehngekî şetrencê yê nerwicî ye. (     )
   - Di cîhana şetrencê de, Xarî Kasbarof weke stêrkekê diçirsîne. (     )
   - Di dîroka şetrencê de, Lîvon Aronyan, baştirîn û xurttrîn lîstikvan e. (     )

## Rêziman

### Bêhnok

Derwêşê Evdî, siwarê Hedban ji êla Şerqiyan bû. Dema êlên milan rastî metirsiya êrîşê hatin, bê dudilî fincana qehweyê ji destê Edûlê; keça serokêla milan, wergirt û ala parastinê hilda. Derwêşê Evdî û 12 mêrxasên kurd, li Girê Etşanê bi lehengî li hemberî artêşa êrîşker rawestiyan û yek bi yek ji bo parastina welat, gihan asta pakrewaniyê. Paşê Derwêşê Evdî, rima xwe hejand û bi lehengî artêş tarûmar kir, lewra êrîşkeran bi daveke tijî fêl û fêlbazî, Derwêş ji ser pişta Hedban anî xwarê û rima bêbextiyê giha gewdeyê wî yê pak.

**1.** Ji hêmaya ku cihê bêhinvedanê  nîşan dide re, çi tê gotin?
**2.** Di nivîsa bûrî de, bêhnok li ku hatiye bicihkirin:
   - **a.** Destpêka hevokê.
   - **b.** Nîvê hevokê.
   - **c.** Dawiya hevokê.
   - **d.** Bersivên li jor giş rast in.

**3.** Ji bilî bêhnokê çi xalbendiyên din derbas bûne.

Mînak:

Xwendekaran, li qada dibistanê, bi dilxweşî hemû rahênanên werzişî, pêk anîn.
Gerestêrka Erdê, her 365 rojan li dora Stêraka Rokê, gera xwe bi rengekî asayî, diqedîne.
.........................................................................................

**Cihên ku bêhnok lê tên bikaranîn:**

Di navbera peyvên hempeywir ên ku dane pey hev de, bêhnok tê bikaranîn.

Şîr, hêk, mast û penêr, bi heybera kalisyomê zengîn in.
Werziş, xwarina siruştî, xewa birêkûpêk û tevgerên gewdeyî yên guncaw, mirovan ji nexweşiyan diparêzin.
……………………………………………………………..............................

Piştî peyvên banglêkirinê, bêhnok tê bikaranîn.

Gelî xwendekaran, xwe ji hemû zanistan bê par nehêlin.
Cotyarên hêja, bi keda we welat geş dibe.
…………………………………………………………………..............
..........................................................................................................

Di navbera cih û dîrokê de, tê bikaranînin:

Heleb, 21.5.2022
Qamişlo, 11. 12. 2022
………………………
………………………

***Têbînî:*** Hin caran piştî peyvên banglêkirinê baneşan jî tê bikaranîn.

Mînak:

Gelî gundiyan! Destê alîkariyê dirêjî, kesên hejar bikin.
Birayên rêzdar! Xwe ji bo werzê zivistanê amade bikin.
…………………………………………………………..........…..
…………………………………………………………..........……

# 3 WERZIŞ



## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. Wêneyê li jor çi derberîn dike?
2. Li gorî wêneyê li jor, navên hin werzişan diyar bike.

# WERZIŞ




Werziş jîn û jiyan e
Qada hemû gelan e
Hezkirinê diçîne
Sînoran qet nizane

Gelek lîsk û yarî ne
Pêşbirk û pêşbazî ne
Pozberî û hevrikî
Xelat û diyarî ne

Lîskên gogê û hêzan
Çemkirin, rev û bazdan
Avjenî û melevanî
Pîroz bin bo yarîzanan

Goga pêyan pir xweş e
Şêrîn e, xweş werziş e
Lîska herî navdar e
Ciwan û hem dilkiş e

Tîm yazdeh lîstikvan in
Leheng û qehreman in
Êrîşker û berevan
Erkên xwe baş dizanin

Du basgir û pasvanek
Tîmek yekdest û zîrek
Tevgera birêbazî
Serkeftin tim daxwazî

Lîskek naz û ciwan e
Hezkera milyonan e
Temaşe kin bilîzin
Ew gula werzişan e

**(Imran Yûsif)**

## Wateyên Peyvan

| Peyv | Wate |
|---|---|
| **Pozberî** | beranberî, tehedî |
| **Melevan** | Avjen |
| **Tîm** | Ferîq |
| **Baskgir** | Kesên ku li hêla baskan dilîzin. |
| **Pasvan** | zêrevan, berevan |

## Guftûgoya Waneyê

1. Malika li jêr şîrove bike:

   **Werziş jîn û jiyan e**
   **Qada hemû gelan e**
   **Hezkirinê diçîne**
   **Sînoran qet nizane**

2. Di kîjan malikê de, dabaşa pircurebûna werzişan tê kirin?
3. Navên sê werzişên herî navdar binivîse.
4. Lîska ku herî  bala te dikêşe çi ye?
5. Li yarîgeha goga pêyan çawa lîstikvan tên dabeşkirin?
6. Helbestvan di malika dawî de, doza çi dike?

## Hîndarî

**1.** Ji helbestê du peyvên hemwate destnîşan bike:

**Mînak:** lîsk – yarî

» ......................

» ......................

**2.** Hemwateyên peyvên li jêr destnîşan bike:

**a.** Yarîzan: (lîstikvan, yarîgeh, zanyar)

**b.** Yekdest: (berbelav, hevgirtî, bêçare)

**3.** Hevokên li jêr ên rast bi (√) û yên şaş bi (×) nîşan bike. Her weha hevokên şaş sererast bike.

**a.** Werziş ji bo hemû mirovan e. (   )

**b.** Li gorî helbestê, lîstika goga zembîlê ya herî navdar e. (   )

**c.** Di lîstka goga pêyan de ji her tîmekê re neh lîstikvan hene. (   )

**4.** Cudahiya her du hevokên li jêr ji aliyê wateyê ve, destnîşan bike:

» Nêrgiz gula civatê ye.

» Ji nava gulan, nêrgiz guleke xweşik e.

## Bîranîn

Cureyeke nivîsa wêjeyî ye; gava nivîskar bûyer an rûdaneke ku bi serê wî de hatibe yan ew bûbe bînerê wê, li gel zanîn û çavdêriyên xwe vebêje, ew nivîs bi navê bîranînê, tê nasîn.

Di jiyanê de gelek zindîwer hene. Hin ji wan bêdeng û rawestiyayî ne, lê bi berhem û xêr û bêrên xwe, me dilşad û kêfxweş dikin, mîna darên mêweyan. Hin ji wan bi tevger û deng in, lê em tam ji ziman û qêrînên wan fêm nakin. Mîna kevok, mih, seh û hwd. Ez her gav bi hestiyarî nêzî zindîwerên din dibim; ez wan mîna xwe weke giyanber dibînim. Ew bi êş, şadî û hestên curbicur dihesin. Di bîra min de tê ku li mala me gelek cureyên firindeyan hebûn; mîna qaz, mirîşk, kevok, elok û hwd. Me ew ne ji bo bazirganiyê xwedî dikirin; mirîşk ji bo hêkan, qaz bo goşt û kevok jî mîna firindeyên xweşik ku malê dixemilînin, dihewandin.

Rojekê dayîka min ji bo dabînikirina xwarina firavînê, hin kevok girtin û xwest piştî saetekê wan serjê bike. Min nema xwe girt, di aşopên xwe de, gelekî tevlihev bûm. Kêr, kevok û xwîn dihatin ber çavên min, lewra min wêrekî kir û ew kevok serbest berdan. Dayîka min ji karê min agahdar bû, lewra him xeydî û him jî girnijî û got: Dilovaniya te di cihê xwe de ye, lê em ji neçarî gelek caran giyanberên din, li gorî pêwîstiyê dikin qurbaniya pêdiviyên xwe.

## Derbirîn

Werziş ji hemû hêlan de, xwedî sûd e; çi werzişên gewdeyî bin û çi werzişên hizrî bin. Derbarê lîskeke werzişî ku bala te dikêşe mijarekê binivîse. Di vê mijarê de, xalên li jêr di ber çavan re derbas bike:

1. Çend kes dikarin tê de beşdar bibin.
2. Qada lîskê çawa ye.
3. Birêkûpêkiya wê çawa ye.
4. Çi sûdên wê hene.

# BEŞA HEŞTEM

## ÇÎROK

1. Bextiyar û Bedbext
2. Silûrî û Tilûrî
3. Rûspiyê Bêdeng

# Armancên Beşê

**Di dawiya vê beşê de, ji xwendekar tê pêşbînîkirin ku bikaribe:**

1. Waneyan bi rengekî dirust û tekûz bixwîne.
2. Naveroka çîrokan baş nas bike û pendê ji wan bigire.
3. Wateyên peyvên nû nas bike û wan peyvan di nivîsên xwe de, bi kar bîne.
4. Di kar û barên xwe de, şîretên mirovên pendyar, di ber çavan re derbas bike.
5. Girîngiya merdî, dilsozî û bexşandinê nas bike û wan taybetiyan di jiyana xwe de, pêk bîne.
6. Pirsnîşanê nas bike û fêrî rewşên bikaranîna wê bibe û di derbarê wê de, mînakan bide.
7. Çîrokê weke cureyekî wêjeyê nas bike û wê ji cureyên din nas bike.

# 1 BEXTIYAR Û BEDBEXT



## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. Divê têkiliyên mirov bi mirovên din re li ser çi bingehî bin?
2. Gelo encama xapandinê çi ye?
3. Gotineke watedar derbarê rastî û xapandinê de vebêje.

# BEXTIYAR Û BEDBEXT



Du bira hebûn; navê yekî Bextiyar û yê din jî Bedbext bû.  Ji ber astengiyên jiyanê, biryar dan ku li kar bigerin û jiyana xwe bi diravên qezenckirî, hêsan bikin. Her du bira gihan serê kaniyekê û xwest bêhna xwe vedin. Bedbext ji Bextiyar re got:” Buxçika xwe bîne da ku em xwarina te bixwin û bila xwarina min ji bêhnvedana bê re, bimîne. Bextiyar bê dudilî xwarina xwe bi birayê xwe re parve kir û her duyan jê têr xwar. Her du bira bi rê ketin û demeke dirêj derbas bû wan xwest careke din, xwe vehesînin û bixwin. Bextiyar got: Êdî dora te ye, buxçika xwe veke da ku em bixwin.

Bedbext got: Ez nadim te, ev para min e!

Ji ber vê nemerdiyê, Bextiyar got: “Ez nema hevrêtiya te dikim; em ê li ser vê duriyanê, ji hev cuda bibin.” Her yek ji wan bi rêyeke cuda de, çû. Piştî demekê, Bextiyar rastî aşekî kevn hat. Wî xwest şeva xwe li wî aşî derbas bike û di kuncikeke aş de, hêwirî. Dem derbas bû, Bextiyar pêjna hin lawiran kir. Şêr, piling, çeqel û rovî, yek bi yek



derbasî hundirê aş bûn. Şêr ji rovî re got: “Ev çi ye, ev demeke te tu nûçeyên nû ji me re ranegihandine?

Rovî got: “Du nûçeyên nû ketine destên min a yekem ew e ku li vî aşî mişkek heye. Ew her roj ji kuna xwe duzdeh zêran der tîne û li ber tavê bi wan dilîze. Nûçeya duyem  jî ew e ku di bin dîwarê aş de, duzdeh kûpên zêr û xişran hene.” Piştî bidawîbûna civîna dirindeyan, her yek ji wan bi rêyekê de çû.

Bextiyar, bi wan nûçeyan gelekî kêfxweş bû! Sibehê zû gava mişk zêr ji kunê derxistin, wî yekser êrîş bir ser mişk û zêr bi dest xistin û paşê kûpên zêr ên binaxkirî, der anîn. Bi van zêr û xişran, koşkeke gelekî bedew ava kir. Ev koşk xwedî duzdeh derîwazan bû. Li ber her deriyekî şirikeke avê, bi cih kiribû. Bextiyar ji berdestê xwe re got: “Kesê ku avê ji şirikê vexwe, wî vexwînin koşkê û bila ez wî bibînim. Roj buhirîn û newbedaran bi sedan rêwî vexwendin koşka Bextiyar. Rojekê çavên Bedbext jî bi koşkê ket û xwest avê ji şirika wê vexwe.

Dema berdestan ew anî koşkê, Bextiyar yekser ew nas kir û qedrekî gelekî hêja şanî wî kir. Di dawiyê de, xwe pê da nasîn û soz dayê ku ev mewda, wê weke du biran li hev parve bikin, lê Bedbext, ev yek nepejirand û got:  “Ez dixwazim tu bibêjî, te çawa ev mewda bi dest

xistiye, ez jî mîna te dixwazim dewlemend bibim.” Bextiyar çîroka aşê kevn û dirindeyan jê re got û paşê Bedbext bi rê ket. Bedbext giha aşê kevn û xwe li kuncikeke tarî, veşart. Şev geriya û bû dema civana dirindeyan. Dirinde, li hev civiyan û dest bi gotûbêjan kirin. Rovî got: “Mezinê teba û dirindeyan, ez dixwazim beriya civatê em baş li hundirê aş venerin. Ji ber ku carekê mirovekî xwe di aş de, veşartibû û hemû gotûbêjên me, bihîstibûn û paşê zêr û xişr bi dest xistibûn.” Dirindeyan venerîna hindirê aş kir û Bedbext di quncika tarî de hat girtin. Dirindeyan biryara kuştina wî da û Bedbext ji ber nerastiya xwe rastî vê çarenûsê hat.

## Wateyên Peyvan

| Peyv | Wate |
|---|---|
| **Duriyan** | Cihê ku rêyek lê dibe du rê |
| **Kûp** | Den |
| **Mewda** | Saman |

## Guftûgoya Waneyê

1. Çima her du bira ji hev cuda bûn?
2. Bextiyar zêr û xişir ji ku bi dest xistin?
3. Dema ku Bedbext hate koşkê, Bextiyar çawa pêşwaziya wî kir?
4. Çima Bedbext pêşniyara Bextiyar a parvekirina mewda nepejirand?
5. Di dawiyê de, çi bi Bedbext hat?
6. Navekî din ji çîrokê re hilbijêre.
7. Sojeya çîrokê bi heval û mamosteyê xwe re parve bike.
8. Li gorî te, Bedbext nîşana çi ye û Bextiyar nîşana çi ye?

## Hîndarî

**1.** Peyvên li jêr di nava hevokan de bi kar bîne:

- Hevrê:
- Mewda:
- Buxçik:

**2.** Hevokên li jêr ên rast bi hêmaya (√ ) û yên şaş bi hêmaya (×) nîşan bike û hevokên şaş sererast bike:

- Bedbext xwarina di buxçika xwe de bi birayê xwe re parve kir. (   )
- Di dawiyê de Bextiyar gelek zêr û xişr bi dest xistin. (   )
- Dema Bedbext çû koşkê, Bextiyar guh lê nekir û rûmet nedayê. (   )
- Bedbext pêşniyara birayê xwe ya parvekirina mewda pejirand û dîsa her du bi kêf û hezkirin bi hev re jiyan. (   )

**3.** Gotinên li jêr li rex hevoka ku heman hestî di nava xwe de dihewîne, binivîsin.

(çavnebarî, comerdî, kêfxweşî)

- Wî yekser êrîş bir ser mişk û zêr bi dest xistin û paşê zêrên binaxkirî, der anîn.
- Ez dixwazim tu bibêjî, te çawa ev mewdan bi dest xistiye, ez jî mîna te dixwazim dewlemend bibim.
- Di dawiyê de, Bextiyar xwe pê da nasîn û soz dayê ku ev mewda wê weke du birayan li hev parve bikin.

## Rêziman

## Pirsnîşan

### Têderxistinok

Ev sirûda li jêr, bi awayê têderxistinokê tê gotin. Dema zarok li hev kom dibin; çi kur bin, çi keç bin, vê sirûdê bi awayekî awazî vedibêjin:

**Ez dibêjim guh bike**
**Tê derxe ev mamik e**
**Ne mela ye b` şaşik e**
**Ne sofî ye b` kumik e**
**Wekî bez ew nermik e**
**Bi rengê xwe gewrik e**
**Bê hestî û nazik e**
**Li beriya gundik e**
**Tema devan xweş dike**
**Cî bin erda hênik e**
**Hingî xweş hindik e**

1. Li gorî te têderxistinok tê çi wateyê?
2. Li gorî te mamik tê çi wateyê?
3. Xwe bikin gurûp û her gurûpek bersiva têderxistinokê binivîse.
4. Li dawiya her du pirsên ku hatine kirin (1-2) çi xalbendî hatiye bikaranînin?
5. Em xwe bikin du gurûp û di damika li jêr de, pirs û bersivan binivîsin:

| Pirs | Bersiv |
| --- | --- |
| ............................................... | ............................................... |
| ............................................... | ............................................... |
| ............................................... | ............................................... |
| ............................................... | ............................................... |
| ............................................... | ............................................... |
| ............................................... | ............................................... |

**Pirsnîşan:** Weke ji navê wê jî xuya ye, ew e xalbendiya ku li dawiya hevokên pirsyarî, tê danîn.

**Têbînî:** Gava ku hevok bi guman be; mirov jê ne piştrast be, li dawiya wê, pirsnîşanê di nava kevanekê de, bi kar tîne.

**Mînak:**

Tê gotin Melayê Bateyî di çerxa 13`an de jiyaye (?)
Pirtûka bi navê Destana Yûsiv û Zuleyxayê ya Ehmedê Xanî ye (?)

..........................................................................

..........................................................................

# 2 SILÛRÎ Û TILÛRÎ



## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. Çima lawir jî mîna mirovan bi rengê komî dijîn?
2. Balinde li ku dijîn?
3. Gava balinde rastî metirsiyê tên, çawa tev digerin?

# SILÛRÎ Û TILÛRÎ



Encumena balindeyan li hev civiyabû, her kes diaxivî, gelo çi rû daye?

Balinde rû bi rûyê mirinê hatine; li wargehên wan hişkîyekê rû daye û ajalan ji ber vê zûhabûnê ji herêmê koç kiriye. Gava tu ji jor de li zemînê temaşe dikî ji bilî erda req, latên mezin û darên pelweşiyayî tu tiştî nabînî. Şahê Balindeyan, gelî encumenê! Ez şêwra we dixwazim; ev hişkahî wê qira me bîne, pêwîst e em bi lez tevdîrên xwe bigirin.

Mezinê şêwirmendan: Afrîdeyên hişmend, ew ê ku zû tev digerin û sûdê ji serboriyan digirin. Di rewşên wisa de, koçkirin, mefa ye. Lê koçkirina korane, dibe ku me rastî qirkirinê bîne, lewra berî koçkirinê pêwîst e em wardozan berî xwe bi rê bikin.

Encumen bê deng ma û nêrîna mezinê şêwirmendan li hişê encumenê

da. Ji bo hilgirtina vî erkî, du balindeyên ciwan hatin pêşniyarkirin. Şahê balindeyan, ev nêrîn pejirand û destûr da her du wardozan ku bi rê bikevin.

Her du balindeyan perên xwe bi ber ba xistin û tîrêjên rojê li serbaksên wan dida û li cihekî bixêrûbêr digeriyan. Ew gihan qiraxên şahnişîneke. Li wê şahnişînê padişahekî nexweş hebû; nexweşiya wî çermî bû. Roj bi roj nexwşî li çermê wî belav dibû.

Gelek pizîşk û nojdar, ji nexweşiya wî bê çare mabûn. Rojekê pizîşkekî karnas ji padîşah re got: “Dermanê te xwîna şahê balindeyan e.” Lewra ji bo dabînkirina xwîna şahê balindeyan, padîşah çareyek ji şêwirmendên xwe xwest.

Şêwirmend li hev civiyan û di dawiyê de, gihan daveke pir seyr:

- Em ê li serê çiyayekî berz, çend serî pez serjê bikin û di nava wî pezê serjêkirî de, em ê lokekî devan bi cih bikin ku di nava wî (hinavê lok) de, kesekî hêzdar xwe veşêre.

Padîşah yekser ferman da û ew dav bi lez hat vedan. Her du balindeyên wardoz, gihan paytexta şahnişînê û li qiraxa wê rêsan. Ew pezê serjêkirî û lokê devan, bala wan kêşa.

Her duwan ji hev re got, ev dav e; pêwîst e em nêz nebin. Her du balindeyên wardoz, bi perên xwe dirêjahiya rê qetand û vegeriyan warê xwe û ji şah re got: “Şahê payeberz! Me tu warekî xweş ji bo nêçîrê nedît!”

Roj bi roj rewş xirabtir dibû û şah, mirina balindeyan her roj li ber çavên xwe didît. Lewra du balindeyên din bi rê xistin. Navên wan Silûrî û Tilûrî bû. Wan jî heman rê girt û gihan cihê davê.

Silûrî û Tilûrî baş li ser cendekên pezên serjlkirî rêsan û bê hizirîn daketin ser goştê wan. Ji birçîna bi lez hinek jê xwarin û ew yekser, vegeriyan warê xwe. Gava ku her du balinde gihan warê xwe, bi lez ji şah û encumenê re got.

Şah, hem kêfxweş bû û hem jî dilbiguman bû. Got: "Gelî encumenê! Em baş bihizrin û paşê em bi rê bikevin." Lê ji ber birçîbûn û gengeşeya ku çêbû, kesî guh li hişmendan nekir û yekser bi rê ketin. Refê balindeyan giha cihê davê. Şahê balindeyan li ser lokê devan danî û dest bi dirandina goşt kir, lê çi bibîne, destek bi lingên wî ve hat û çav lê hatin girtin. Xircir bi ref ket û leşkerên padîşah êrîşî refê balindeyan kir. Şahê balindeyan dîl hat girtin û çavên wî li koşka şahê mirovan hatin vekirin.

Şahê mirovan bi dengekî bilind keniya: "Ev zanebûna te ye! Ma wisa ew xwarina biçêj xweber hatiye danîn! Tu xweş şah î!"
Şahê balindeyan got: "Ê ku bi ya Silûrî û Tilûrî bike, wê rewşa wî wisa be!"

Şahê mirovan doza gûzanekî tuj kir. Şahê balindeyan pir xemgîn bû; ne ji ber dîlgirtina wî, lê ji ber xapandina ku bi sedema Silûrî û Tilûrî bi serê wî de hat. Şahê mirovan ji lingê wî çend dilop xwîn standin û paşê ji ber nasîna nirxê şahê balindeyan, ew bexşand û serbest berda.

## Wateyên Peyvan

| Peyv | Wate |
|---|---|
| **Encumen** | Meclis |
| **Hişkahî** | Zuhayî |
| **Lat** | zinar, teht |
| **Wardozn** | Mirovê ku doza cihekî nû dike. |
| **Şahnişîn** | Emperatorî |
| **Rêsan** | Bi rengekî bazinî firîna li jor. |
| **Lok** | hêştirên nêr, deve |
| **Karnas** | pispor, xebîr |
| **Cendek** | term, laş |
| **Dirandin** | jêkirin, qetandin |
| **Koşk** | Qesr |

## Guftûgoya Waneyê

1. Ji ber çi encumena balindeyan li hev civiya bû?
2. Mezinê şêwirmendan, çi pêşniyar kir?
3. Dermanê padişahê nexweş, çi bû?
4. Çima her du wardoz nêzî pez û lokê devan nebûn?
5. Silûrî û Tilûrî, çawa tev geriyan?
6. Li gorî te, pêwîst e Silûrî û Tilûrî çawa tev bigeriyana?
7. Çawa şahê balindeyan kete davê?
8. Piştî ketina davê, ji ber çi şahê balindeyan xemgîn bû?
9. Padîşahê mirovan çima padîşahê balindeyan serbest berda?
10. Tu çi sûdan ji vê çîrokê digirî?

## Hîndarî

1. Peyvên li jêr di nava hevokan de bi kar bîne:
   a. Encumen:
   b. Lok:
   c. Padîşah:
2. Ji waneyê hemwateya peyvên li jêr destnîşan bike:
   a. Payebilind: …………….   Zemîn: ………..…
   b. Barkirin: ....……………....   Biryar: …………...
3. Em li gorî waneyê xalên li jêr bi rêk û pêk bikin:
   a. Rêzgirtina şah û serbestberdana wî ji aliyê padîşah ve. (   )
   b. Tevger û xebata balindeyan ji bo dîtina çareyekê. (   )
   c. Dîtina xwarinê ji aliyê Silûrî û Tilûrî ve. (   )
   d. Ji ber zuhayî û hişkiyê, alozbûna rewşa balindeyan. (   )
   e. Plankirin û vedana davekê ji şahê balindeyan re. (   )

## Çîrok

Ew nivîseke wêjeyî ye; dibe ku bi rengê pexşanî yan helbestî bê vegotin. Di çîrokê de, dibe ku bûyer aşopî yan rasteqîn be. Armanc ji çîrokê, qedandina demeke xweş an sûdwergirtina ji serboriyên mirovan û qezenckirina pendekê ye.

### Tevdîra Mişkan

Li welatê Mêrdînê li nav gundê Cilînê
Pisîkekî xurt û şeng bûbû xudan nav û deng
Mişk nehiştin di malan giş revîn qul û çalan
Kîjanê wan dihat der pisîk xwe zû davêt ser
Welê mabûn mat û gêj yekî wanî boçdirêj
Digot: Gelî hevalan em girtî man di çalan
Rêkê bo me çar bikin an jî ji vir bar bikin
Mişk neman tev dicivin bo vê yekê peyivîn
Her yekî yek digotin kezeb ji xwe disotin
Yekî wanî rîspî digot ev e min rê dî
Du zengilan bibînin bidin yekî bişînin
Heke ji ku pisîk dî bila têxe situyê wî
Çi gav dengê zengil bê wer zanibin ku ew tê
Bil lez û bez veşirin nema hûn kes dimirin
Gişkan digot : Welê ye tevdîreke li rê ye
Lê di nav xwe kes nedîn ku wî karî biqedîn
Pisîk serbest hiliştin wî jî her ew dikuştin

**(Osman Sebrî)**

# 3 RÛSPIYÊ BÊDENG



## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. Di rewşên zehmet de, divê mirov çawa tev bigere?
2. Gava mirov rastî şîretkirinê tê, divê:
   a. Paşguh bike.
   b. Pêk bîne.
   c. Baş bihizire û heke bi sûd be, pêk bîne.

## RÛSPIYÊ BÊDENG

Tê gotin ku li herêmekê zuhayiyeke dijwar rû dabû; ne baran di dema xwe de hat û ne jî xelkê baş bergiriyên xwe girtibûn. Ji vê rewşê, mirovên herêmê gelekî perîşan bibûn û her kes li çareyekê digeriya. Ji wê herêmê du mirovan ji bo dabînkirina pêdiviyên malbatên xwe xwest li karekî bigerin û pê dijwariya vê rewşê li ser malbatên xwe sivik bikin. Her du bi rê ketin û di encama gera xwe de, rastî gelek astengiyan hatin. Di dawiyê de, li bajarekî mezin bi cih bûn. Her yekî ji wan karekî cuda dikir û bi qezencên wî karî alîkariya malbatên xwe dikir. Her demekê hev didît û pirsa rewşa hev dikir. Sal buhirîn û her ku diçû bêrîkirina wan ji cih û warê wan re, zêde dibû. Cara dawî gava her duyan hev dît, biryara vegerê da. Her du bi rê ketin û bayê bêrîkirinê gavên wan xurtir dikirin.

Di rêya vegerê de, her duyan pirsa qezencên hev dikir. Yekî ji wan baş dirav dabûn ser hev û yê din jî bi tenê sê zêr qezenc kiribûn. Êvarî li gundekî hêwirîn û li odeya rûspiyê gund bi cih bûn; xwarin û vexwarin ji wan re hat pêşkêşkirin û şevbuhêrk geriya. Di şevbuhêrkê de, tiştekî bala her du rêwiyan kêşa; rûspî vebir nediaxivî. Wan ji berdestê wî pirsî, çima ew naaxive; qey lal e?! Berdest: Na, rûspiyê me pir hişmend e; ew kêm diaxive û her gotineke wî bi zêrekî ye! Rêwiyê ku kêm dirav qezenc kiribûn çû ber destê rûspî û daxwaza şîretekê kir.

Rûspî got: Heger sibehan kêşwer ewravî be, bi rê nekeve.

Rêwî, ji qolana xwe zêrek kêşa û xist destê rûspî.

Gava vegeriya cihê xwe, rêwiyê din qeşmeriyên xwe pê kirin û got: “Te zêrê xwe bê hûde, da rûspî!”

Rêwî careke din xwe nêzî rûspî kir û daxwaza şîreteke din kir.

Rûspî got: Heke tu rastî avekê hat, bê rêber xwe li avê nede.

Rêwî cardin zêrek da û bi sistî vegeriya cihê rûniştinê.

Hevalê wî hîn bêhtir tinaziyên xwe pê kirin, lewra careke din bi tengezarî xwe nêzî rûspî kir û daxwaza şîreteke dawî kir.

Rûspî got: Tengezariya şevê bihêle heta sibehê.

Bû sibe kêşwer ne aram bû; li asîman ewrên reşbelek li ser hev diqulipîn.

Rêwî: Ka em bi rê bikevin.

Rêwîyê şîretkirî: Kêşwer ne aram e, ez nayêm.

Hevalê wî got: Va ez bi rê dikevim; dixwazim zû bighêjimm xizmên xwe.

Rêwiyê din çend rojan li odeya rûspî ma û paşê gava ku kêşwer aram bû, bi rê ket. Di rê de, rastî komeke berfê hat, gava nêz bû, dît hevalê wî ji ber berf, baran û sermayê, qefiliye û jiyana xwe ji dest daye.

Rêwî pir xemgîn bû, lê ji ber ku rê dirêj bû hevalê xwe spart axê û diravên wî ji bo malbata wî weke sparte hilanîn. Di rê de, rêwî rastî çemekî hat, çem pir gur bû, lewra şîreta rûspî hat bîra wî: “Bê rêber xwe li avê nede”. Rêwî dît ku siwarek li ser pişta hespekî zînkirî dixwaze li avê bide. Rêwî ji siwar re got: “Li avê nede, av pir gur e.”

Siwar, guh li gotina rêwî nekir û xwe li avê da. Pêl, pir xurt û şelû bûn, lewra zû ew binav bû û hespê  wî xwe ji noqbûnê rêzgar kir. Rêwî bi zînê hesp girt û siwar berav çû. Rêwî destê xwe da xurcezîna hesp, dît ku gelek zêr tê de hene. Rêwî bi ser pişta hesp ket û da qiraxa çem û li cihekî buhirînê geriya. Li beravê çem şivanek dît û pirsa cihê buhirîna çem jê kir. Şivan got: Hêsan e, piştî sed metreyî buhirek heye. Rêwî got: “Heke ez zêrekî bidim te, tu yê li pêş min çem bibirî.”

Şivan got: “Ser her du çavan!” Şivan bi lez çem derbas kir û zêrê

xwe stand. Rêwî di pey re bi aramî çem derbas kir. Rêwî bi rê ket û derdora paşîvan gihaşt malê. Hespê xwe li axur girê da û berê xwe da hundir, lê tiştekî seyr dît; mirovekî biyanî li mala wî razayî bû. Ew pir hêrs bû û destê xwe avêt xencera xwe, lê şîreta rûspî hat bîrê; " tengezariya şevê bihêle sibehê" lewra destê xwe ji ser xencerê da alî û li benda sibehê ma. Rêwî bi dengê hevjîna xwe veciniqî û hişyar bû: "Kurê min bavê te hatiye!"  Kesê biyanî, kurê wî yê mezin bû. Rêwî kurê xwe hemêz kir û her sê şîret bi dilxweşî bi bîr anîn.

## Wateyên Peyvan

| Peyv | Wate |
|---|---|
| **Bergirî** | Tevdîr |
| **Vebir** | qet, yekcar |
| **Qolan** | Pişteka ku dirav tê de tên veşartin. |
| **Qeşmerî** | henek, tinazî |
| **Hûde** | Sûd |
| **Buhirîn** | Derbasbûn |
| **Paşîv** | Xwarina ku piştî şîvê tê xwarin. |
| **Axur** | Xaniyê dewaran. |

## Guftûgoya Waneyê

1. Çima her du mirovan ji herêma xwe koç kir?
2. Di dema vegerê de, ew li ku hêwirîn?
3. Çima rûspî bê deng bû?
4. Şîreta yekem çi bû?
5. Çima rêwiyê şîretkirî rastî tinaziyan hat?
6. Çima rêwiyê şîretkirî sibehê bi hevalê xwe re bi rê neket?
7. Di dema buhirîna çem de, rêwî çawa tev geriya?
8. Şîreta sêyem çi bû?
9. Serenavekî nû ji waneyê re binivîse.

## Hîndarî

1. Ji peyvên li jêr re, du hemwateyan binivîse:
   - Perîşan: ……………          ……………
   - Dijwar: ……………          ……………..
2. Ji peyvên li jêr, peyva ku ji aliyê wateyê ve dûrî peyva sorkirî ye, destnîşan bike:
   - Qefilî: (qerisî, qerimî, cemidî)
   - Şelû: (nezelal, girik, şil)
3. Peyvên li jêr li rex hevoka ku heman hestî dihundirîne, bi cih bike:

   **Dilsozî – Kêfxweşî – Xemgînî**

   - Hevalê wî ji berf, baran û sermayê, qefiliye û jiyana xwe ji dest daye.
   - Diravên wî ji bo malbata wî weke siparte hilanî.
   - Rêwî kurê xwe hemêz kir û her sê şîret bi dilxweşî bi bîr anîn.